

ARMANC  
Ji mehê  
carekê  
dertê  
Hejmar: 107-108  
Tebax-Îlon  
1990  
Buha: 10 Skr.  
3 DM

# Armananc

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

ARMANC  
Monthly  
Kurdish  
Magazine  
No: 107-108  
August-September  
1990  
Price: 10 Skr.  
3 DM


## Buhrana Xelîcê û berpirsiyariyên li pêş tevgera milî ya Kurd

Çareserkirina pirsê  
Xelîc  
bi çareserkirina  
pirsê Kurdî ve  
girêdayî ye

r. 4

Beyana Sekreterê  
Gîştî yê PPKK  
Serhad Dîcle li ser  
buhrana Xelîca  
Îranê

r. 5



Di vê hejmarê de bi alîkarî û beşdarbûna Bavê Nazê û Mehmed Uzun em du quncikên nuh; "NEYNIK" û "FERHENGÂ LÎTERATÛRÎ" vedîkin. Ji nuha û pê ve wê Bavê Nazê û Mehmed Uzun dayîmî di van quncikan de binivîsin. Di vê xebata wan de em ji wan re pêşketinê dixwazin û sipasên xwe pêşkêş dikin.

REDAKSIYON

Li Swêd cînyeteka rejîma îranê ya nuh

## Ajanên îranê keça Qazî Mihemed Effat Qazî kuştin

Berî niha bi salekê ajanên îranê Dr. A. Qasimlo û du hevalên wî li Wiyanayê kuştin.

Pîştî wê ev bû du kes in ku li Swêdê dikujin.

Ajanên istixbarata îranê li Swêdê, li bajarê Vesterosê careke din destên xwe di xwîna Kurdan gerandin, pîreka Emîr Qazî, keça Qazî Mihemed; Effat Qazî kuştin.

Roja 6'ê îlonê pakêtek bi bombe xistin qutya postê ya mala Emîr Qazî. Li gor informasyonên Emîr Qazî û texmîna polis armanc, kuştina Emîr Qazî bû. Lê bi tesdufi wê rojê Emîr Qazî naçe qutyê venake, pîreka wî Effat Qazî vedike. Bi vekirina pakête re bombe dîtçe û Effat perçe perçeyî dibe.

### Sistîya polis

Wek tê zanîn ev ne cînyeteka rejîma îranê ya pêşî ye, berî çend mehan, havînê, cardin li bajarê Ny-neshamnê endamekî PDK-îranê di mala wî de bi çakûç kuştin. Polisê Swêdê qatîlê wê cînyetê jî heta nuha negirtiye. Wê gavê jî hevalên ê kuştî, mesûlên PDK-îranê istixbarata îranê û konsolosên wan ên Swêdê mesûl nişan dabûn, lê ne hukûmetê û ne jî polis, vê îddîaya Kurdan pîrr



Effat Qazi

ciddî negirtibûn. Lê piştî kuştina Effat Qazî, hin nuh dest pêkirin gotin "wele Kurd di îddîayên xwe de ne neheq in."

### Di bin siya şer de paqijkirina Kurdan

Sekreterê Gîştî yê "Parastina Zarokan" Thommas Hammarberg dibêje, "min bala hukûmetê kişandibû û gotibû ku piştî rawestandina şer, îran û Iraq li hember Kurdan wê bi hev re bixebitin. Nuha, di bin siya gelsa Xelîcê de jî bo paqijkirina muxalefê şanseki din bi dest xistine." Lê hukûmetê wek di mesela Kurdan de, gotinên T. Hammarberg jî di ser guhê xwe re avêtibû. Lema jî li hember ajanên îranê Iraqê tu tedbir ne-

girtin. Û netîca vê sistîyê jî bû sebebê kuştina Effat Qazî. Effat Qazî 54 salî bû û diya du keçikan bû, yek 17 salî û yek jî 10 salî ye.

Emîr Qazî berê bi PDK-î re bû û endamê Mekteba Siyasa bû. Di sala 1986'an de ew û çend hevalên xwe jî partiye veqetiyên û heta nuha wek grûbekê xebata xwe didomandin. Lê di buhara îsal de partiyeke bi navê "Partiya Serxwebûna Kurdistanê" avakir û ew jî bû serokê wê.

Berpirsiyarê PDK-îranê îbrahim Çorapçî di beyana xwe ya di rojnama Dagens Nyheter de dibêje, divê hukûmeta Swêdê tedbirê bigre û divê Konsolosxana Îranê wek konsolosxanekê bixebite, ne wek merkezê terorîzmê.

NEYNIK



Mehmed  
Uzun

rûpel: 8

Ferhenga Lîteratûrî

Amadekar: Bavê Nazê

rûpel: 12

Konferansa Kurdên Sovyetê:

Dîrok û Dema Nû

r. 2-3

# BIRYARNAMA DAWÎN

## ya Konferansa Îlmî ya Yekîtiya Sovyetê

### "Kurdên Sovyetê: Dîrok û Dema Nû"

Di 25-26'ê Tebaxa 1990'î de li Moskovayê Konferansa Îlmî ya Yekîtiya Sovyetê ya bi navê: "Kurdên Sovyetê: Dîrok û Dema Nû" çêbû. Di xebata konferansê de Kurdnas, civaknas, aktivîstên civakî, nivîskar, berpirsiyarên din yê rewsên-bîrî yê Sovyetî û yê ne Sovyetî û her weha hin rewsên-bîrên Kurdên ji derva beşdar bûn.

Di konferansê de pirsên civakî-siyasî û netewî-çandî yê jiyana Kurdên Sovyetî bi awayekî fireh hatin muneqeşekirin. Di rûhiyeta nû ya demokratîk û îradanîşandayîna azadane de rewşa dîrokî ya Kurdên YKSS'ê ji aliyê cur be cur de ji nû ve hate analîzkirin. Di rapor, daxuyanî û axaftinên beşdarên de li ser momentên pozîtîf hate rawestandî, ya ku di gellek aliyê jiyana netewî-çandî ya pêşveçûna Kurdan de heye.

Bi vê yekê re, li ser sosretîya polîtîkaya netewî ya ku di salên Stalînzîmê de ku li ser Kurdan dihate ajotin; li ser înkarkirina mafên netewî yê Kurdan, ji holê rakirina (di sala 1929'a de) senceqa (uezda) Kurdistanê, Krasnova Kurdistana (Kurdîstana Sor) li Komara Azerbeycanê, li ser asîmîlekirina bi darê zorê û nefîkirina wan di salên 30-40' an de, qedexekirina dibistanên netewî û pirtûkderxistina bi zimanê Kurdî, li ser tehrîfkirina rastiyên li ser hejmarên Kurdan li YKSS'ê hate rawestandî. Ecêb e, lê, di salên perestroykayê de ji pirsê Kurdan nayê helkirin, mafên wanê netewî yê ku di salên zordariyê de hatîbûn rakirin, ji nû ve paşve nayên dayîn.

Di pêşvabirina karûbarên weşanxanî de, di rêdana weşanên radyoyê de, dersdayîna bi ziman û edebiyata Kurdî de zehmetî tîn dîtin. Çapkirina rojnamekê û radyoyeke Kurdî li Ermenîstanê û Gûrcîstanê bes bersîva daxwazên beşekî Kurdan dide. Li welatê me wek pratîk xebata koordînasyonî ji bo tetmînkirina hewcedariyên netewî-manewî yê gelê Kurd tuneye. Di herêmen cihê cihê de temamiya kom û weşan ûhd. yê netewî-çandî ku kar dikin tenê rewşa beşekî Kurdên YKSS'ê îfade dikin. Êdî bi salên dirêj eqeliyeta Kurdî di organên bilind yê Yekîtiya Sovyetê de bêşdar nebûye û vê paşiyê di

hilbijartinên nûçebûyî de di organên komarî yê yekîtiyan de jî berpirsiyarên Kurdan tune.

Di encama gelemperî ya vê dema nuha de, her çiqas, polîtîkaya rastkirina xeletî û tehrîfkirina di polîtîka netewî de hatiye qebûlkirin jî, bicîanîna mafên netewî ya eqeliyeta etnîkî ya Kurdan di eslê xwe de ber bi rewşek xerabtir ve diçe.

Di konferansê de li ser tûnebûna peywendî û girêdanên çandî di navbera Kurdên Sovyetê û Kurdên dervayî de, li ser tûnebûna îmkânên peydakirina weşanên Kurdî ji derveyî welêt hate axaftin, û nerazîbûn hatin zîmên. Beşdarên konferansê, dan xwuyakirin ku li Yekîtiya Sovyetê ji zû da dema bicîanîna weşanên Kurdî bi bikaranîna tîpên Latînî hatiye. Li ser vê pirsê bi yekdîtînbûn ku tûnebûna vê, di mesela bikaranîna hemû weşanên Kurdî ji bal hemû Kurdan ve diwarên sûnnî çêdike, ev tişt, çawa ku welatê me hatiye beşkirin, zîmanê me jî her weha beş dîke. Li ser bilindbûna enteresa tabîî ya Kurdên Sovyetê û endîşeyên wan li ser qedera têkoşîna bi qerardarî û xwîni ya hemnetewiyên wan ji bo mafên netewî-demokratîk û mafêçarenûsî bîr û bawerî hatin pêşkeşkirin. Beşdarên Konferansê mixabin, vê rastiyê tespît dikin ku polîtîkaya fikîrandina nû hê negihîştîye ser Kurdan û ser têkoşîna netewiyî ya wan, li ser binîrxirina ciyê wan di karûbarên navnetewî û peywendiyên Rohilat-Roava de.

Beşdarên konferansê, di derheqê bêdengmayîna Yekîtiya Sovyetê li hember jenosîda tevayî ya Kurdan û li hember nefîkirinên wan û bikaranîna çekên kîmyayî li Kurdistana Iraqê di sala 1988'î de ecêpmayîna xwe nîşan didin.

Em dibêjin ne normal e ku alîkarî û piştgirîya wan ji rejîmên ku têkoşîna adil ya gelê Kurd ji bo mafên xwe yê netewî bi hovîtî difetisînin.

Em hêviyên xwe nîşan didin ku, her çiqas heya nuha nebûye jî, Yekîtiya Sovyet di ruhê fikirandina nû de dê bibe însiyatîfîgirê muneqeşekirina pirsê netewî ya gelê Kurdê mezlûm di rexistinên navnetewî de û bi taybetî di orga-



Piştî konferansê; S. Bedredîn, Mahmûd Osman, Babaev, Nadirov, Mihoyan û Kendal Nezan di cîvîna pressê de (Foto: C. Heyderî)

nîzasyona Netewên Yekbûyî de.

Rapor, daxuyanî û axaftinên ku di konferansê de hatin berpeşkirin tabloya giştî ya rewşa netewî-hûqûqî ya Kurdên li YKSS'ê didin xwuyakirin.

Encam, pêşniyar û hukumên bingehîn didin ji bo ku organên bilind yê karbidestî bala xwe bidîne. Konferans bi yekdîtî-nêye ku tasfiyekirina otonomiya senceqa Kurdî di 1929'a de, binpêkirina mafên netewî yê Kurdan sosret e. Girêdayî bi van gotin û daxwazên bingehîn yê Kurdan ji bo paşdevegerandina otonomiya Kurdan bi mekanîzmayên kêrhatî, pewîst e mekanîzmên ku bicîanîna mafên netewî yê Kurda li YKSS'ê garantî dikin, pêk-bên. Ev pewîstîyeke acil e û bêderengmayî û bêtêxîrkirin, pewîst e bidirustî bi wan bîr mijûlbûn. Ji bo efektîfir fonksiyonebûna jiyana netewî-çandî ya Kurdan ji her alî da, divê xebata koordînasyonî bê danîn. Vê fonksiyonê dibe ku organîzasyonêke civakî wek yekîtiya giştî ya Kurdên YKSS'ê bi cih bîne ku ji mekanîzmayên kêrhatî, ji koma pirsên konkret û ji komîteyên îdarî yê ku ji berpirsiyarên Kurdên Sovyetî ji hemû herêmen yekîtiyê pêktên.

Di vê planê de damezrandin û pêşvebirina merkeza çandî ya Kurd li Moskovayê bi beşên xwe di herêmen ku Kurd tê de dijîn, xwedî grîngîyek taybetîye.

Konferans, hêviyên xwe nîşan dide ku organên bilind yê xwediselehîyet bi pirsên

jiyan û xebata Kurdan rabin yê ku di ciyên peywendiyên netewî yê germ û tûj de ne, û bi problemên ku girêdayî bi vê yekê ne, rabin.

Ji bo vê, pêkanîna îmkana paşdevegerandina otonomiya senceqa Kurdistanê bi rêdana bicîbûna Kurdan li wir, yan jî kombûna piraniya Kurdan di herêmekî Yekîtiyê de bi şertên baş yê tebtet-îklîmî û damezirandina otonomî li wir.

Konferans bawerîya xwe nîşan dide ku, tetmînkirina mafên netewî-demokratîk yê Kurdên Sovyetê bi pêkanîna jiyanekek kompakt jî mimkune ku di hemû ciyên Kurd karibin bi şertên baş tê de bijîn û ev jî aliyê organên karbidest yê merkezî û jî vên herêmi bîr kontrol û garantî kirin.

Konferans organîzekirina weşana radyo ya Kurdî ji Moskovayê; pêkanîna weşanxanên Kurdî li ser bingehê alfaba Latînî ji bo pêkanîna lîteratûra Kurdî jî girîng dibîne.

Konferans bi her awayî piştgirîya siyaseta guhertinê demokratîk, domkirina liberîzekirina jiyana civakî-siyasî û netewî ya li welêt dîke, ku şertên mûhim in ji bo serfirazî û pêşveçûna bi aheng a hemû gel û neteweyan.

Dîroka Kurdan ya devlemend û bi bûyerên dramatîkî va tîjî, me dide bawer kirin ku; azadî û serfirazîya gel, ne bi rîya danîna menfeetên gelekî li hember menfeetên gelekî din, lê, lihevanîneke harmonîkî, gramî û bawerî nîşandayîna bi hev û dû dibe, yê ku buyerên wek egoîzm,

jiyana girtî û êrîşkarîya manewî ya neteweyetî redîkin.

Di vê rewşa dijwar ya welêt de, ji bo pêkanîna atmosfereke weha ya ku bikaribe şertên pêşveçûna bi her alî ya gelên mezin û piçûk garantî bike, Kurd baweriyên xwe ji tradîsyon, girêdanên dîrokî û manewî yê baş muhafaze dîke ku bi gelên di nav wan de dijî.

Serokê Komîte Organîzekirinê Akademîk ji Akademiya îlmî ya Kazaxîstanê

Nadirov, N. K.

Serokê duyem, alîkar Dîrektora Enstîtûya Marksîzm Lenînzîmê li ba KM ya PKYS'ê

Kitaev, Î. N.

Endamê Komîte Organîzekirinê Endam-Korespondenta Akademiya Îlmî ya Ermenîstanê

Mihoyan, Ş. X.

Sekreterê Berpirsiyar Serokê Rexistina "Yekbûn"

Babaev, M. S.

Endamê Komîte Organîzekirinê Berpirsiyarê beşa peywendiyên netewî ya Enstîtûya M.L. li ba KM ya PKYS'ê, Doktorê Îlmên Felsefî

Behramov, E. A.

Sekreterê Berpirsiyar Rojnamevan

Evdalê, E.

Namzetê Îlmên dîrokî, serokê grupa li ser lêgerîna problemên gelên ku zordarî dîtine, li beşa peywendiyên netewî li Enstîtûya Marksîzm Lenînzîmê li ba KM ya PKYS'ê

Trapeznîkov, H. E.

<p>Redaksiyon: M. Eli, Zinarê Xamo Hesen Mizgin, Lewend Firat, Mîrza Bextiyar Redaktore berpirsiyar: M. Eli Berpirsiyarê beşê Dîmîkî: Malmîsanîj</p>	<p>Adres: Armanç P. Box 6004 172 06 Sundbyberg Sweden</p>	<p>Telex: ATTN ARMANC 11053 TELE KC Telefax: ATTN ARMANC 46-8-801826</p>	<p>Ansvarîgulgiyare: Kurdîska Demokratîska Arbetar Unionen Postgrot: 50 37 90-9 ISSN: 0345 7365</p>
--	---	--	---

Kurdên Sovyetê:

# DÎROK Û DEMA NÛ


**D**i bin vî navî de, rojên 25 û 26'ên Tirmeha sala 1990'î de konferansek ilmî -emelî, li paytexta Sovyetîstanê, li Moskovayê li darket. Lê li gora gotinên hinên beşdar û roj-namevanên Sovyetî; konferansa Kurdan mîna civînek tezahurî bû û pirr dûrî karê ilmî bû. Gelo çima Konferansa Kurdên Sovyetê qerekerê xwe yê ilmî guhert?

Berpirsiyarên konferansê dibêjin ku tevlihevbûn ew bû ku celebek ji kesên beşdarbûyî, ne haya wan ji ilm hebû û ne jî pêwendiyên wan pê re hebû. Qebûlkirina wan di konferansê de, rengê ji rengên kompromîsê bû. Weku tê zanîn ew kes berî civîna Kurdan bi rojekê, meşek li Moskovayê çêkiribûn. Û roja din piştî giftûgoyeke dirêj heqê beşdarbûna konferansê xistin destên xwe.

**B**i xwe piraniya wan xelkan, cotkar, karkir û şivan bûn. Ew ên ku Ezerbeycanî, Ermenî û Qirgiziyî, bi darê zorê ew ji erdê xwe rakiribûn, malên wan talan kiribûn. Wan ji hikûmeta Sovyetî, daxwaza parastina jiyana zarokên xwe û temîna ciyekî li ser rûyê erdê ji xwe re dikirin. Ji hemû qewmên Sovyet ên mişext, tenê ew bê xwedî bûn û dewletek ji derveyî sînoren Sovyetê nebû ku piştî wan bigre û wan bihimîne. Ew bûn (nêzî 20 hezar kes) heya niha bêyî cî û war mane, ji ber vê yekê ew bi seriyên germ hatin konferansê û berê wê guhertin û nezan û zane bûne dubendî û her yekî seriyek kişand. Nûnerên nezan derketin ser menbera konferansê û bi qîrîn digotin: "**Nan bidin zarokên me. Cî bidin me. Kincan bidin me. Em kulturê naxwazin, em medrese naxwazin, em parastina jiyana xwe dixwazin.**" Li wira pêwîste bête gotin ku wan kesan tamîna jiyana xwe tenê di çerçewa otonomiya Kurdîstanê Sor a ku di sala 1923'an de hatibû damezrandin, diditîn.

Bi rastî jî, di hundirê konferansê de, du grûb, du nêrîn xweş ji hev dihatin cuda kirin. Nêrîna alimên Kurd ên Sovyetî, bi seroktiya akademyên me Nadîrê Nadirov û Şakîrê Mixoyan, ew bûn ku Kurd jî riyalîteta jiyane siyaseta xwe deynin. Wan digot ku di rewşa Sovyetê ya wiha de ji bo Kurdan otonomiya kulturî ya herî ber bi aqilayê.

Gelo atonomiya-kulturî çiyê û de çawa be? Li gora ravekirina xwediyên vê nêrîne, Kurd dikarin heya qonaxekê bi rîya mafên kulturî xwe biparêzin. Ew dibêjin; deverên ku Kurd lê dijîn, pêwîst e zarokên wan di dibîstanê de bi zimanê xwe bixwînin, her wiha jî divê pirtûk û rojname bi zimanê Kurdî bêne belavkirin û weşandin. Di şûna avakirina wehdak idarî, li herêmen Kurdan komelên wan çêbibin. Statuya van komelan ew bû ku bikaribin bi navê Kurdan bipeyivin, nûnerên wan di parlamento û belediyan de ciyên xwe bigrin. Li gora wan, bi vê yekê xwe-



Bîstek ji Konferansê



Berî konferansê Kurdên Sovyetê li Moskovayê meşekê çêdikin

naskirina netewî, li cem Kurdên Sovyetê de bilind bibe û di paşerojê de, ewê bikaribin çerçewa mafên xwe firehtir bikin.

Bêguman, ev nêrîn heya derecekê rast e. Ew ji ber wan tiştan rast e;

- 1- Ji ber siyaseta real
- 2- Ji ber sewiya siyasî ya nizm li nik Kurdên Sovyetîstanê û nebûna rêxistînek Kurdî yekbûyî.

Bi rastî jî rewşa Yekîtiya Sovyet a îro, pirr aloz û dijwar e, her deverê û herêmek jê, ji ber sebebên aborî, qewmî û siyasî, li ber teqandinê ye. Ji ber vê yekê gotinek ne di ciyê xwe de, dikare bibe problemek mezin. Loma jî, ji Kurdan re hin gavên bi pîvan divên.

**H**eger sedema pêşî ji hoyên derveyî îrada Kurdan çêbûbe, lê ya duyem ji hoyên zatî tî. Di hundirê 70'ê salî de, ronakbîrên Kurd xebatek ji bo şiyarbûna netewî nekirine. Pêla qonaxa demokrasîyê bi ser wan de hat, ew ji bo vê yekê ku qebûl bikin û belav bikin ne amade bûn. Ne tenê wiha, ew heya niha jî nikarin xwe ji xewa xwexapandina sosyalîzmê xilas bikin. Her şopa wan diçe ser partiya Komunist û tu pêwendî bi kes û hêzên muxalefê re ne hatiye dayîn.

Ji bilî vê yekê, di heyamê dawî de, hate xwiyakirin ku pîrsa dîni di nav Kurdên Sovyetê de, hîn pirr xurt maye. Ew wilo dijwar e heya di hêle ku dubendî di nav kurdên xwedî dînekê çêbibe. Mesela Kurdên Yezîdî ku netewa xwe Kurd dihesibînin û dîne xwe yê Yezîdî dibînin, roja îro hem-berî wan şerekî mezin ji aliyên Yezîdiyên ku netewa xwe Kurd nabînin, vebûye. Herçî Kurdên Misulman, erê piraniya wan(ji bilî yên Azerbeycanê) xwe Kurd dibînin, lê belê nîşek ji wan ji Yezîdîyan nefretê dikin. Û ne bi derewa şêxên pêşverû hatin konferansa Kurdan û doza lihev hatinê dikirin. Şêx Hesên nayîbê muftiyê Qazaxîstanê ku bi netewa xwe Kurd e bi van gotinan berê xwe da Kurdên Misulman û yên Yezîdî û got: "Heger ji min bipirsin tu Kurdî yan tu Misulmanî? ezê bibêjim; berê ez

Kurd im û dûre ez Misulman im." Paşî wî gotina xwe berdewam kir û got: "Merovê Kurd bi dîne xwe çî dibe bila bibe, lê em hemû bira ne." Muftiyê Kurd bi wê manê got ku "dîn ji bo Xwedê ye, netewe û welat ji bo me ebda ye." Û Şêx Mûraz, Şêxê Yezîdiyên Gurciya di gotina xwe de wilo got: "**Kurdên Yezîdî û yên Misulman kurên bavekî ne û zarên dêkî ne. Di rojên teng de gerek ew hîn bêtrî piştî hev bikin.**" Piştî ku Şêx Mûraz gotina xwe bire serî, ji menbera konferansê daket, wî û Şêx Hesên hevdu hembêz kirin.

Lê mixabin ne hemû Şêx dilên wan li ser mîletê wan diêşîn. Hinin hene ku roja îro tifaqa xera dikin.

**B**i giştî ev itîcaha durist di tevgera Kurdên Sovyetê de ye. Lê itîcahekî din heye ku xwediyên wê bi her awayî muhaweke dikin ku tevlihevbûn di nav Kurdan keve. Sedema vê yekê ji ber sergermî û nezaniya wan tê. Ew bi xwe siyaseta xwe ya çewt venaşêrin. Ew bi rengê vekirî dibêjin; da ku em bighên mafên xwe, divê rewşa kurdan hemûyan li Sovyetê xirab bibe. Di nêrîna wan de; dêmek hin Kurd xweş dijîn(ji Komarên Sovyetê Kurd nisbî li Ermenîstanê, Gurcîstanê û Qazaxîstanê ne xirab dijîn) emê nikaribin bi hev re rabin û doza mafên xwe bikin. Ji ber vê yekê ew li van hersê komaran bi agir dilîzin. Ew geh nama ji serokên wan komaran bi rê dikin û daxwaza veqetandina erdê ji bo hemû Kurdan dikin. Ew daxwaza vê yekê dikin tevî xweş dizanin ku daxwazên wan bê bîngehin. Tenê mebesta wan pê ev e ku destelata van komaran nefretê ji Kurdên cî re bikin û ji wan re bêjin: "Em bi we re deng nakin îcar hûn doza axa me jî dikin! Yelax ji cem me rabin!" Helbet ev siyasetek avanturîstî û ziyane digîne tevgera Kurdî li Sovyetê.

Diyar e pêwîst e bête gotin ku hemû Kurd li gel stendin û vegera otonomiya Kurdîstanê ne. Lê belê ev daxwaza pîroz ji aliyê hinekan jî bo berjewendiyên şexsî bi kar tên. Û bêtî babîsokên demogojî derbasî nav mîlet dibe.

Bi taybetî Kurdên mişext dibên listika vê siyasetê. Çimkî rewşa Kurdên qewirî, wek rewşa mirovê li ber xerîqandinê ye. Ew destê xwe li her tiştî dipelîne. Lê heyala tişt wî merovî xilas nake. Wilo jî, tenê daxwaz wê roja îro Kurdên Sovyet, ji tahlûkê xilas neke. Çimkî realîta jiyane qanûnên wê yên taybetî hene û li gora daxwaza merovan naçe serî. Roja îro, her kes pê dizane ku otonomiya Kurdîstanê Sor a ku di çerçewa sînorê Ezerbeycanê de di sala 1923'an de hatibû avakirin, niha rûniştvanên Ezerbeycanî lê dijîn. Dibe ku piraniya wan Kurd bin jî, lê nîşek mezin ji wan xwe Kurd nabînin. Êdî çare çî ye? Bera wan xelkan din û Kurdan bixin şûna wan? An jî Kurdan bibin deverêke din û otonomiyekê ji wan re ava bikin? Lê li ser erdê kê? Û kî qebûl dike? Û gelo Kurd tenê mişext û bê cî mane? Li ser vê pîrsê, aloziya rewşa welat bi giştî mamoste Nadîrov di axaftina xwe de got: "**Lê ne tenê rewşa me Kurdan wiha ye, Tatar, Almanî, Tirkên Mîsket jî hene û hemû dixwazin vegerin ciyên xwe yên berê.**" Gelo çilo di warê emelî de, ev yek dikare here serî?"

Di vî warî de mamoste Şakîro dibêje: "**Emê bibêjin erd hate veqetandin û xanî hatin avakirin. Lê çilo wê kar jî sed hezaran, li ciyên nuhavakirî bête temîn kirin?**"

Ji şûna ku Kurd bi hev re rûn û bi yek nêrîne daxwaza ji destelata Sovyetî bixwazin û rewşa xwe bi wan bidin naskirin, hinin kesan bi qîrîn digotin: "Kultur multir me navên, me alim û alimdar navên..." Û bi dehan gotinên wiha tewş dihatin gotin. Diyar e Sazanov (endamê Komîta Merkezî ya Partiya Komunistê Sovyetî) ne xwest van sloganên di ber guhên xwe re bavêje, wî li ser vê yekê di gotina xwe de got: "**Kurdino, em rewşa we ya dijwar xweş fêm dikin. Lê bizanibin, erdê ku kultur lê nebe, wê erdekî bê gel be!**"

Weku em dibînin rewşa Kurdên Sovyetî pirr çetîn e û gelek pîrs di vî warî de tene meydanê û ew di ciyên xwe de ne. Lê çî bête gotin

û çî nêrîn bê dayîn, divê pîrsa bîngêhî ji ber çavan wînda nebe. Ew jî eve ku problema Kurdên Sovyetî, problemek aktûal e û divêtê bête etlahî bête çareserkin. Heger hat û bi derengî bikeve, dê gelek nexweşiya bi xwe re bîne û ne tenê ku xwîna merovên negunehkar bête rijandin. Ji ber vê yekê grûbên ku roja îro seroktiya tevgera Kurdên Sovyetê dikşînin divêtê bi yek dengî bang bikin û bi yek hêzê doza mafên xwe bikin.

Û damezirandina komîsyonekê ji 6 parlamenteriyên Sovyet û nûnerên Kurdan(Nadîrê Nadirov, Şakîrê Mixoyan û Mihemedê Babayev) da ku herin Komara Azerbeycanê û pîrsa Kurdîstanê Sor bi destelatê re dersbikin di nêrîna me de tişteki mezin e û gaveke ji çalakîyên bi hev re. Her wiha jî, wê pirr baş be, heger Kurdên me di hundirê komelakê de, xwe li belediya Moskovayê qeyd bikin. Ev tişt mumkun e. Nûnerê belediya Moskovayê bi xwe di konferansa Kurdan de got: "Em bendî we ne ku hun komela Kurdên Moskovayê bidamezirînin. Kengî hûn vê yekê bikin, emê bi dilekî xweş û vekirî we di nav koma komelên mîletên din ên mîna we qebûl bikin."

**W**eku em dibînin, gava pêşî ji bo Kurdan tê avêtin û bi destxistina mafên netewî, berî her kesî li ser Kurdan bi xwe dimîne. Diyar e, pêwîst e bête gotin ku mêvanên konferansa Kurdan ne hindik bûn. Ji rexê Sovyetî gelek kesên navdar hebûn. Ji wan parlamenterên Sovyetî Oleynik û berpirsiyarê beşê pêwendiyên di nav netewan de Sazanov, Ri-yabov berpirsiyarê pîrsa netewî û Kîtayiv nayîbê rektorê Institutê Marksîzm-Lênînzîmê û yên din.

Ji mêvanên Kurd Ezîz Muhamed, Samî Ebdulrehman, Kendal Nezan, Kemal Fuad, Mehmet Alî Aslan, Seîd Mistefa, Seîd Mula, Mihemed Salih Cuma, Îsmet Şerîf Wanlî û Ehmed Qaramûs û hinin din.

**Bavê Nazê / Moskva**

## RAMANÊN RAMANWERAN

## Çareserkirina pîrsa Xelîcê bi çareserkirina pîrsa Kurdî ve girêdayî ye

Murad Ciwan

Iraqê bi îşgalkirin û îlhaqkirina Kuveytê dinya rakir ser piyan. Buhran û xetera ku îro li herêmê peyda bûye bi wî awayî tesîr li dinyayê dike ku ji Şerê Cihanê yê Duduyan vir de rûdanek wiha bi tesîr û berbelav li ser ruyê erdê peyde nebûye.

Loma jî bi Rojhilat û Rojavayê xwe, bi bakur û başûrê xwe ve cara pêşîn e ku hewqas welat çî di çerçewa biryarên Neteweyên Yekbûyî de bin, çî jî di riya karûbarên din de bin raya xwe dikin yek û bi hev re gavan davêjin. Bi riya biryarên Neteweyên Yekbûyî re hemû welatan daxwaza wê yekê diyar kirin ku divê bê qeyd û şert Iraq ji Kuveytê vekişe û hukûmeta kevî a welêt were ser hukum. Ev daxwaza herkesî ye, lê gelek welat hene ku qîma xwe bes bi vî nayn û eşkere diyar dikin ku armanç hilweşandina rejîma dîktatorî ya Seddam e jî. Amerîka, hukûmetên welatên Rojava û Îsraîl eşkere diyar dikin ku vekîşîna Iraqê ji Kuveytê têr nake, divê ew rejîma Iraqê ya ku nayê zefî bikeve, rejîmek zefî were ser hukum, çekên kîmyayî û îmkana çekîrîna çekên nukleer ji destê Iraqê bê girtin. Serokên dewletên Ereban bi xwe jî bi riya berdevkên xwe didin diyarkirin ku êdî nema karin baweriyê bi yekî wek Seddam binin, di rojên pêş de pêre rûnên, kar bikin û piştî xwe pê ve girê bidin. Heta Tirkîyê jî di riyên neresmî û îndîrekt re diyarkir ku li Iraqê bi guhartînek wek a Bûlgariya razîye. Yanî li Bûlgariya çawa Jivkov çû lê Partiya Komunîst ma, li Iraqê jî bira Seddam biçe lê partiya BAAS û rejîma niha, li ser hukum bimîne. Çend hêz û welatên Ereban ne tê de, ew dewletên cihanê yên ku eşkere eşkere doza hilweşandina rejîma Iraqê nakin jî ji niha ve didin xwiyakirin ku wê ne li dij bin ku Seddam bikave. Gava meriv rastîyê bêje, xwîya ye piçêkî rewşê lê hatiye. Li aliyekî Iraqê û li aliyê din gelek dewletên Ereban ên din. Ji bo her welatekî mezî û piçûk hêsan bûye ku zû bi zû berê xwe bide Seddam û li rex dewletên Ereban ên din cih bigre. Lê çî dibe bila bibe, îro dinya serê Seddam dixwaze.

Baş e wê serê Seddam çawa bê firandin? Di esafî de du rê ji bo wê yekê hene. Yek jê derxistina şerekî ye li dijî Iraqê. Ya din jî ew e ku bi ambargo û abluqên îktisadî, siyasî, diplomasi û eskerî Iraqê bê tecrîdkirin, bê birçîhiştin û bi şerekî

navxwe an îngîlabeke hundirî rejîmê bê xistin. Herçî hîn şer nehatiye derxistin lê ev herdu awe jî îro li kar in. Wê dawîya dawî bi giranî kîjan bê tercîhkirin ew hê ne diyar e. Herçî hukûmeta Amerîka û yên welatên Rojava eşkere diyar dikin ku riyên "aşîxwaz" bi ser nekevin wê şer derxin jî, hin hoy hene ku dibin sebebê tercîhkirina vî yan wî awayê çareserkirina meselê. Ew hoy jî di du waran de xwe diyar dikin. Warek jê yê qonaxa berî ketina rejîma Iraqê ye. Yanî riya herî bi tesîr û kêrzerar a xistina rejîmê çî ye? Warê din jî ew e ku piştî xistina rejîmê di şûna wê de rejîmeke çawa tê xwestin.

Helbet hukûmetên Ew-

serokîtiya Seddam de bû xeterê jî Îranê mezintir û ev netîce îro derket. Îro jî ji bo ku rejîma Seddam bê xistin bêyî ku bê fikirîna wê çî netîca di rojên pêş yê dîr û dirêj de bide, alîkariya Tirkîyê û ya dewletên totalîter û otorîter ên Ereban tê kirin. Bi milyaran pere û çek pêşkêşî wan dibin.

Loma jî bo gelên herêmê û ji bo hemû gel û hêzên aşîxwaz û edaletxwaz ên cihanê gelek girîng e ku bala xwe bikîşînin ser vî meselê û bibin xwedî pêşniyar û çareserkirina meselê de, bi israrî çareserkirinek esafî bixwazin.

Çimkî çareserkirinek bi vî yan wî awayî tesîrek mezî li mal û can û jiyana hemû gelan dike. îro krîz û

ye ji bo wî. Zane eger bi ser nekeve wê bimre. Loma jî ji bo biserketîne çî ji desta bê wê bike û wê rehîna bike hedefên êrîşên ji derva de. Heta ew bi xwe wê wan bikuje û îlan bike ku yê êrîş anîne ser Iraqê ew kuştine. Gava di şerekî li dijî Iraqê de, bi hezaran Ewrûpayî û Amerîkî bîn kuştin, Seddam bê xistin jî ew ji bo raya giştî ya Ewrûpa û ya Amerîka nabe serkeftin. Gelek zahmet e ku hukûmetek Rojava cesa-reta encamek wiha bike.

2) Rîska duduyan ew e ku, gava rejîma Iraqî bibîne ku di şerekî leşkerî de wê tîk biçe, amade ye ku hemû bîr û çavkaniyên petrola Iraqê û ya Kuveytê bi hewa xe, agir berdê. Li gor pisporan karekî wiha wê

**Di dîrokê de belkî tu carî berjewendiyên Kurdan bi vî awayî li gor berjewendiyên welatên cihanê pêk nehatine. Îro fîrsetek tarîxî derketiye ber Kurdan ku wê yekê nîşanî cihanê bidin. Lê gelo Kurd wê karibin, yan na! Ev jî wê di rojên pêş de diyar bibe.**

rûpa, yê Ereban û dîrîr ên herêmê di mesela warê duduyan de gelek kûr û dîr û realist nafikirin. Çerçewa dîtin û bîr û baweriyên wan, berjewendiyên teng û çavnebar yê çek û petrolê û yê endustriyên dîtin in. Rejîmeke zefî û di zefî de bes e ji bo wan. Ew edalet, aşî, îstîkrarî û ewlekariyek dîr û dirêj nagrin ber çav. Berjewendiyên wan ên roja îro jî her tiştî girîngtir in. Loma pirê caran çareserkirinên ku ew dibînin gelek caran bi wî rengî ne ku ne çareserkirin in, lê muwazenê jî hin welatan ber bi hin welatên din dibin, problemên di bin perdên xwedêgiravî îstîkrar û ewlekariyê de vedîşînin, ev jî ji bo demê kurt dajon, roj tê bi gurrûnek hîn xeterî serî hil didin. Nimûnên wê yê herî baş di tarîxa herêma Rojhilata Navîn de eşkere dibin. Ew peymanên ku piştî Şerê Cihanê yê Yekem hatin morkirin tu problem çareser nekirin, birîn kûrtir kirin lê bi zorê hatin kurepîstkirin. Ji wê rojê heta îro jî car bi car derd û êş û elem li herêmê her û her serî hildidin. Nimûna şerê Îran û Iraqê jî ji bo wê yekê gelek balkêş e. Du sal berê di şer de gava Îranê zora Iraqê bir, bi Rojhilat û Rojavayê xwe hemû welatan her awe alîkarî û piştgirî dan Iraqê da ku zora ordiya Îranê bibe û wê paşde vekîşîne. Bi saya vî piştgirî û alîkariyê Îran paşde vekîşîya, lê Iraq di

buhayîya ku bi vî meselê re li hemû cihanê rû daye û li ser kîsê miletan tê hesabkirin îspata wê yekê ye.

Bi bawerîya min jî bo çareserkirina buhrana Xelîcê ku karibin xwedî pêşniyarek herî realist û qenc bin, Kurd in. Çimkî rewş wiha geriyaye ku çareserkirinek ku mesela Kurd bi xwe re çareser bike wê karibe bibe çareserkirinek ji bo menfeeta gel û welat û rejîmên herêmê jî û ji bo ya welatên Rojhilat û Rojava yê dinê jî.

Hilweşandina rejîma dîktatorî ya Iraqê jî berê de daxwaza gelê Kurd bû, îro welatên Ereban, Îsraîl, Îran, Amerîka û welatên Ewrûpa jî tê de, bûye daxwaza hema hema temamê milet û welatên cihanê. Lê bi çî awayî? Bi bawerîya min xistina dîktatoriya Seddam di riya şerekî navnetewî de (her çiqas çara dawî be jî ji bo hin welatan) riya herî xeter û bi zerar e, rîskeke mezî ji bo herêmê û cihanê peyde dike. Ji alî Kurdan de jî wê bigihê qonaxek wilo ku tevgera Kurdî di nav lingan de biçe û piştî şer jî negihîje tu mafekî xwe yê netewî û demokratîk. Ev rîskên ku şer wê bi xwe re bînin çî ne?

1) Yek jê ew e ku bi hezaran rehînen Ewrûpî û Amerîkî li Kuveytê û Iraqê di nav lepên rejîmê de ne û li war û meqerên stratejîk hatine cîwarkirin. Gava şer derkeve, Seddam zane ku ev êdî mesela mayîn û nemanê

encamek wisa bide ku bîrên petrolê pêncî salan temamî bişewitîn û tu fêde ji wan neyê dîtin.

3) Ordîya Iraqê bi awakî gelek zêde xwedî çekên kîmyayî ye. Gava rejîm bibîne ku wê tîk biçe, çekên kîmyayî û nukleer di destê Amerîka û Îsraîl de hebin û zanibe ku ew ê bikar binin jî dîsa wê çekê kîmyayî bi kar bîne. Herçî çekê kîmyayî, dibe ku tesîrek zêde li ordiya Amerîka neke jî, lê wê Îsraîl zirarek gelek mezî jê bibîne. Zirarek mezî wê bigihîje Tirkîyê, Kurdistanê û welatên Ereban yê cîran jî.

4) Şerekî çekdarî di serokîtiya Amerîka û hevalbendên wê de, wê nasjonalîzm û şovenîzma Ereban û ya gelên Musulman gelek gurr bike. Gava Seddam bi darê zorê ji alî Amerîka ve bê xistin, wê Ereban gelek pê biêşin ku bi şerefa wan hatiye lîstin û ji xwe dijminatîya ku heye wê hîn xurttir bibe û bi salan bajo. Ev jî ji wê tî ku di tarîxa bûyerên welatên Ereban û ya şerê wan ê bi Îsraîliyan re ruyê Amerîka û hukûmetên Rojava gelek reş e. Di mesela Îsraîl de Ereban tim derb ji Amerîka xwarine û bawerîya gelê Ereban bi wê nayê.

Ev çar xal bendîni gelek xurt in ku Amerîka bi xwe û hukûmetên Ewrûpa, xwe jî şerekî çekdarî radigirin. Li alî din gelek sedemên

Dûmahîk r. 11

## Stîriyên me

Lawîkê Berrîvanî

## Xwendevanên Zarokan

Li welêt mezinkirina zarokan gelekî rehetir bû. Meriv çêdikir û dûre fena çêlikên mirîşkan berra ber malê didan. Êdî ew bi xwe ji xwe re bi firê diketin. Piştî ku bi firê diketin li malê dê û bavê û birayê mezî, li kuçê hevalê jê xurttir, li mektebê mamoste bi çar-êrê û bi silan ew baş "terbiye" dikirin. Ev "terbiyekirin" gelek rehet dibû; çimkî li gor "kultura" me hestiyê zarok ji dê û bavê re û goşt jî ji mamoste û ji hostê re bû.

Lê li Ewrûpayê ne ew mamoste û ne jî ew hoste hene; herçî heq û huqûqê dê û bavîyê û hurmeta ji mezinan re ye zarok pênc qurîşê xwe jî tê nadin. Li vir "hestî jî û goşt jî" yê zarokan in û loma jî zarok zû bi zû wek "bav û kalên" xwe nabin. Ji ber vî jî hemû dê û bavên Kurd li Ewrûpayê pîrr xemgîn in; zarok ji dest diherin, divê hin "tedbîr" bînin standin.

Gotinek pêşiyên Tirkan a meşhûr heye, dibêjin: "Yê li keça xwe nexê wê sibê li çonga xwe xe."

Li welêt bicîanîna vî şîretê pîrr hêsan bû, çimkî em bi destên xwe bûn!

Ji bo ku Kurdên li Ewrûpayê "li çonga xwe nexin" divê em çer bikin?

Carê berî her tiştî em dizanin ku dar bi terî xwar dibe, lema jî divê meriv ji biçûkaniyê dest pê bike. Mana wê jî ew e ku, zarok çer ji diya xwe bû, divê marşa "Em Kurd in, Kurd in/ Mêr û gernas û merd in/ Roja cengê em şêr in/ Xwedanê tac û zêr in" rojê pênc caran wek ferzên nimêjê di guhê zarok de bête gotin. Piştî vî, hawê mezinkirînek gelekî muhîm e. Bê şîk divê zarokên Kurd gelekî bi terbiye û bi edeb mezî bibin. Mesela, divê li hember mezinan bi hurmet û li hember piçûkan jî bi şefqet bin. Divê tim bi gotina diya xwe bikin, ji ber birayê xwe yê mezî daxûn û ji bavê xwe jî wek Ezraîl bitirsîn. Divê li hember bavê xwe û mêvanan tu carî nigên xwe dirêj nekin, tim bi çarmêrkî rûnin. Em bibêjin gava yekî mezî hat hundur, divê zarok tevîlê jî ber qam bike û heta mêvan rûnêne divê ew jî rûnêne, wek eskerekî her li pê bisekine.

Zarokên Kurd divê bi kultur û entelektuel bin. Serê her tiştî jî divê tarîxa xwe ji ber zanibin. Wek nimûne; Serhîldana Elyîyê Betê, Serhîldana Cemîlê Çeto û Serhîldana İbrahîm Paşayê Milîî bi çîrok û bi stranên wan ve divê wek dengbêjekî karibin tê bi ta vekin.

Guhê zarokên Kurd ji piçûkkayî divê fêrî muzîkê jî bibe. Ji bo wê yekê jî divê serê sibînan bi dengê Mihemed Arîfê Cîzrawî jî xew rabin û êvaran jî bi hemasiyên Kawls Axa tîkevin xew.

Zarokên Kurd divê ji edebiyata Kurdî ya "modern" jî bê par nemînin. Herçî got çîrok e, bê şîk divê ji Firat Cevherî dest pê bikin, di ser wî re tu carî gav nekin. Û gava beş bibe roman, wek "klasîkên Kurdî" ên "modern" divê ji Brîndar û Şîrê jî divê ji Wazgal û Feqîr Ahmed dest pê bikin. Li alî din di warê dramê de jî divê ji behemên Mahmûd Baksî muheqeq nesibên xwe bigrin û kultura xwe bi pêş ve bibin.

Ji van zanînen kulturî, tarîxî û edebî bikeve, serê her tiştî divê zarokên Kurd siyasî bin, yanî ji "emrê" bavê xwe dernekevin û siyaseta bavên xwe bajon. Em bibêjin gava bav ji partiya xwe xeydî û ji hevalên xwe re dest bi xeberan kir, divê ew jî bixeyidin û dest bi xeberan bikin. Û ku piştî çend rojan gava bavê dest bi pesindayîna partiyek, hêzek nuh kir, divê ew bêtîfaqiyê nexin nav malê û gotînen bavên xwe dubare bikin. Na ku zarok bêrêfî kir û ji emrê bavê xwe derket, wê gavê jî divê bav raste rast "darê zorê" bi kar bîne û dê jî şîrê xwe lê helal neke.

Bi kurtayî divê zarokên Kurd mûkî ji bav û kalên xwe şaş nekin, wek wan bijîn û wek wan rabin û rûnin...

Yanî di piçûkaniya xwe de divê zarokîtiya xwe nejin; nejin, ji bo ku gava mezî bûn ji nuh ve bibin zarok...

## Beyana Çapemenî

# Buhrana Xelîcê û berpirsiyariyên li pêş tevgera milî ya Kurd

**Beyana Sekreterê Giştî yê PPKK(Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan) Serhad Dicle li ser buhrana Xelîcê Faris**

Piştî ku rejîma dîktatorî ya Iraqê bi êrişek hov Kuweytê îşgal û îlhaq kiriye, herêma Rojhilata Navîn bûye wek fiçiyek barûdê ku her gav dikare bîteqe. Ger Iraq dev ji vê êrişkariya xwe bernede, tê xwiyakirin ku şerek wê derkeve û ev şer wê hemû dinyayê bihejîne.

Mesûlê esasî yê vê buhrana derketî û yê şerê her ku diçe nêztir dibe, dîktatoriya Seddam e ku bêşereftirîn û dijmintirînê gelan e di nav rejimên Rojhilata Navîn de. Lê li alî din riyakariyek mezîn e ku Amerîka û hukûmetên Rojava yê kevneperest li hember êrişên rejîma Seddam behsa mafê hukûmanîya miletan, aştîyê, însaniyetê û edaletê dikin. Berî her tiştî yê ku rejîmeke wiha êrişkar û dijminê gelan derxistin, yê îmkân, hêz û cesaret dan Seddam ku bi vê hovîtiyê rabe, Amerîka, Yekîtiya Sovyetan, Çîn, Fransa, Îngiltere, Almanya Federal û dewletên ditir yê bi hêz ên Rojhilata Navîn ne. Van hukûmetan di dema şerê Îran û Iraqê de û piştî wê, çavê xwe li wê xwînrejîya Seddam girtin û bi her awayî alîkarî danê. Wê ordiya Iraqê ya yek milyoni, çekên kîmyayî jî tê de ji alî Yekîtiya Sovyetan, Çînê, Fransayê û Almanya Federal bi her awayî hat çekdarkirin. Hukûmetên Amerîka û Awrûpayê jî alî pere, teknoloji, ticaretê û istixbaratê de ji bo Iraqê gelek comerdî kirin. Gava rejîmê li Helepcê û li herêman din gelê Kurd bi çekên kîmyayî qetîl kir, gava çar hezar gund kaviil kirin van hukûmetan tu gav li hember Iraqê neavêtin, çav li karên rejîmê ên qirêj û xwî-nî girtin. Seddam ji van awayan cesaret girt û êrişkariya xwe gihand vê merhelê.

Îro jî gava hukûmetên Rojava û Rojhilata Navîn hember rejîma Iraqê radiwestin, mixabin ku ne ji alî mafê hukûmanîya miletan, aştîyê û ewlekariyê lê ji alî berjewendiyên xwe yê çavnebar yê herêmê li meselê dinêrin. Lê ditina kijan dewletê li ser buhrana Xelîcê çî dibe bira bibe ev nabe sebêb ku gelên herêmê, hêzên şoreşger û welatparêz li cem Seddam çiyê xwe bigrin. Hela hela

tu kes nikare ji gelê Kurd bixwaze ku li hember filan yan bêvan dewletê piştigiriya rejîma Seddam bike.

Gelê Kurd hê berî buhrana Xelîcê jî bo doza xwe ya adil a milî û ji bo mafê xwe yê jiyanê li hember rejîma Seddam şer dikir. Tu sebêb li meydanê tunene ku dev ji vî şerê xwe berde. Ger piştî îşgal û îlhaqa Kuweytê ji alî Seddam de, xeterî jî bo welatên dinê û herêmê mezintir bûbe ev dide nişan ku şerê gelê Kurd ê li hember rejîma Seddam çiqas bi heq û adil e. Di rewşek wiha de wazîfe ne ew e ku gelê Kurd çiyê xwe li rex hinekan bigre, divê hinên din çiyê xwe li rex doza adil a gelê Kurd bigrin û bi maddî, manewî piştigiriya vê dozê bikin. Helbet gelê Kurd piştigiriya wiha ne ji hukûmetên kevneperest û menfeetperest lê berî her tiştî jî gelên hemû welatan û jî hêzên demokratîk yê wan dipê.

Baweriya PPKKê ew e ku him jî bo rabûna buhrana Xelîcê, him jî ji bo helbûna problemên din ên Rojhilata Navîn û jî bo pêkanîna aştîyê adil û bi îstikrar ji Kuweytê, jî hemû perçên Kurdistanê, jî Filistinê û jî erdên dagirkirî yê Ereban hemû hêzên dagirker divê bê şert û derhal vekîşin û divê serbixweyî û hukûmanîya wan welatan bê naskirin.

PPKK ne di wê baweriyê de ye ku bi serê xwe leşker şandina Amerîka û welatên din jî bo herêmê û şer derxistina wan li hember Iraqê pirsê hel nake. Li hember vê PPKK piştigiriya biryarên Netewên Yekbûyî dike ku ambargoyek ekonomîk danîne ser Iraqê. Ji dêvla leşkerên dewletan ên bi serê xwe, rasttir e ku leşkerekî navnetewî girêdayî bi NY li herêmê bi cih bibe û di rîya leşkerekî wiha de Iraqê bê mecbûrkirin ku vekîşe. Di pêkanîna leşkerekî wiha de divê welatên wek Tirkiyê ku ji alî mesela Kurd de teref e beşdar nebin û leşkerên welatên ku wê karibin bêterefiyek azamî nişan bidin divê bîn beşdarkirin.

PPKK li herêmê çawa li diji mudaxela eskerî ya Amerîkayê ye, her wiha li

dijî wê yekê ye ku Tirkiyê li rex wê yan Iraqê têkeve şer. Ji bo pûçkirina planên dewleta Tirk a li ser beşdarbûna şerekî leşkerî, berpirsiyariyek mezîn dikeve ser milên hêzên demokrasiyê û yê aqlsalîm ên Tirkiyê û Kurdistanê. Gelê Kurd divê bi taybetî aktiftir li diji şerekî wiha raweste. Get ne lazim e meriv kahîn be ji bo ku ji nuha de bibîne ku gava şerek di navbera Iraq û Tirkiyê de derkeve, wê li herdu aliyan Kurdistan bibe kaviil û wêran.

Buhrana Xelîcê, wazîfên gelek acil û berbiçav derxistina pêşîya hêzên netewî yê Kurdistanê Iraqê. Berî her tiştî ew berpirsiyarî tê ku divê xwe bicivînin ser hev, hêzên xwe yek bikin û li hember rejîma dîktatorî ya Iraqê şerê çekdari gurr bikin, lê bes bi şerê çekdari nemînin, şerekî milî yê pîralî li dar xî. Helbet tiştê herî acil ew e ku rejîma Seddam bikeve. Lê divê tevgera netewî ya Kurd bibe xwedî programeke gelek konkret e demokrasiyê û mafên netewî. Heta îro tevgera netewî ya Kurdistanê Iraqê, şîara "Demokrasi bo Iraqê û otonomî bo Kurdistanê" bilindkir bîyî ku naveroka wê dagire. Lê îro jî şîaran wêdetir armanç û daxwazên berbiçav divên. Helbet daxwaza hukûmetên Rojava ew e ku rejîma Seddam bixînin û hukûmetek zeif binin. Lê jî bo gelê Kurdistanê ya eslî ew e ku dîktatoriya Seddam hilweşe û di şûna wê de rejîmeke demokratîk pêk bê ku mîletê Kurd û Ereban hev bin, qasî hev karibin mafên xwe yê serbestî û hukûmanîyê bikarbin. Divê ew sistema ku hukûmanîya bi temamî dixist destê Bexdayê, ew xurt dikir û dihişt ku bê pîrs û bê hesab vî hukmî jî

PPKK li herêmê çawa li diji mudaxela eskerî ya Amerîkayê ye, her wiha li diji wê yekê ye ku Tirkiyê li rex wê yan Iraqê têkeve şer. Ji bo pûçkirina planên dewleta Tirk a li ser beşdarbûna şerekî leşkerî, berpirsiyarek mezîn dikeve ser milên hêzên demokrasiyê û yê aqlsalîm ên Tirkiyê û Kurdistanê. Gelê Kurd divê bi taybetî aktiftir li diji şerekî wiha raweste. Get ne lazim e meriv kahîn be ji bo ku ji nuha de bibîne ku gava şerek di navbera Iraq û Tirkiyê de derkeve, wê li herdu aliyan Kurdistan bibe kaviil û wêran.


xwe re bikar bîne, bi temamî bê rakirin, îmkân û hêza hukûmetê di nav Ereban û Kurdan de wek hev bê parêkirin. Ew sistema ku partiya BAASê dike partiya dewletê, ordî, polis, mahkeme û îdaran û hemû mekanîzma burokrasiyê dixê bin lepên BAASê, divê bê perçekirin. Sistemê wiha bê danîn ku pîrr partîtiya li ser esasên parlamentariyê bê danîn, dewleta huqûqî, edalet (mahkeme) û idare û qanûnderxistin jî hev bîn cihêkirin bi serê xwe bin û hemû maf û azadiyên aborî, siyasî û civakî yê demokratîk bîn garantîkirin. Divê tevgera Kurdî bibe xwedî programeke wiha ya demokrasiyê û mafên netewayetî. Ger li Iraqê rejîmeke wiha demokratîk bê avakirin, wê hukûmeta Bexdayê tu carî nîkaribe her tiştî bi ya xwe bike, wê têkeve bin qeyd û merbendê. Ev yek wê him garantiyê jî bo mafên netewî yê gelê Kurd bîne him jî rê bigre ku hukûmetek jî bo cîranê xwe tehdîtkar û êrişkar were ser hukûmanî, yan li ser hukûmanî bîmîne.

Programeke wiha dikare him piştigiriya hêzên demokrasiyê yê dinê û ya hukûmetan bigre him jî desteka wan dewlet û welatên Ereban bigre ku xetera rejîmeke wek a Seddam li ber çavên xwe ditin.

Wazîfêk din jî heye ku hêzên hemû perçên Kurdistanê divê pê rabin. Ew jî ew e ku rola potansiyala şoreşger û demokratîk a tevgera Kurdî jî bo derketina ji xeterê nişanê raya giştî ya cihanê bidin, ku bi çavê xwe bê îstikrarî û bêtemeliya ewlekariya herêmê bi wesîla buhranê dit. Çimkî her wekî di bîngêhê vê buhranê de ya ku her û her xetertir dibe, her wiha di bîngêhên buhran û wan şeran de ku do derketin û sibê jî wê derkevin ew peymanên em-

peryalist ên wek Lozanê hene ku piştî Şerê Cihanê yê Pêşîn xerîta Rojhilata Navîn kişandin. Hemû gelên cihanê, hukûmet û rêxistinên netewî û navnetewî vê rastiyê divê ne bi hesabên taktîkî bibînin, ku heta gelê Kurd li herêmê negihîje azadiya xwe, heta Kurdistanêk serbixwe û hukûmanî neyê danîn lîngên muwazena Rojhilata Navîn li ser destekên jî bûzê ne. Îro îmkân û hêza bîndestkirina Kurdistanê ne di destê Seddam de bûya tu carî wê nîkaribûya cesareta vê êrişkariyê di xwe de bidîta. Îranê jî her wiha wê nîkaribûya doza îxracîkirina şoreşa xwe û bîndestkirina welatên Musulman bikira. Tirkiyê wê jî Balkan heta Asya Navîn li pey nîfûzek Tirk baznedaya. Kurdistanêk serbixwe ku li herêmê bê avakirin, wê bibe kevîreki herî saxlem yê ewlekariyê û îstikrarê, wê rê li ber emelên êrişkariyê û hegemonyatiyê bigre. Li alî din Kurdistanêk serbixwe wê li gor mafên gelên Tirk, Ereban û Faris be jî ku daxwaza wan aştî, ewlekariyê, azadî û jiyanek bilind e.

Em Kurdistanêk serbixwe deynin alîkî, hebûn û bîhêzbûna tevgera netewî ya Kurd bi serê xwe jî rolek mezîn dilîze di şerê demokrasiya wan welatan de û ewlekariya herêmê û cihanê de. Ger li Kurdistanê Iraqê tevgera netewî ya xurt hebûya, Seddam bi vê bêperwariyê êrişî Kuweytê nedikir û gef li herêmê nedixwar. Ev jî dide nişandan ku piştigiriya maddî û manewî ya hemû perçên Kurdistanê him jî bo hêzên demokratîk û pêşverû yê herêmê bi wesîla buhranê cihanê çiqas xwedî girîngiyek heyatî ye. Loma jî piştigiriya tevgera Kurdî jî hesabên taktîkî wêdetir, berpirsiyariyek stratejîk û dîrokî ye.



**Perwîz Cîhanî**

**Perwîz Cîhanî:**

**“ KULTURA KURDÎ, DERYA E**

**Armanc:** Seyda Perwîz Cîhanî, ji kerema xwe re hinekî ji xwendevanên rojnama me Armancê re li ser kovara Sirwe bipeyive. Kingî û çawa derket?

**Perwîz Cîhanî:** Her wekî tê zanîn, zagona binêsiya Komara Îslamiya Îranê di esla 11'an de mafê xwendin û nivîsandinê bi zimanê zikmakî-ku mafê her kesî ye- azad ragehandiye. Gorekî vê eslê, xwendin û nivîsandina zimanê zikmakî yê nav xwe yê gelanên Îranê û weşanên wan li rex zimanê Farisî azad û serbest e. Vêca bona bi cîanîna piçek ji vê eslê û her wisa ser daxwaza gelê Kurd û bi têkoşîna komeke ji torevan û dilsozên torê û edeba Kurdî, bi serwêriya mamostayê mezin û paya bilind rehmêtî Mihemed Emîn Şêx El Îslamî, naskirî bi "Hêmin", dewleta Komara Îslamî ya Îranê di bahara sala 1364 koçiya tavî, beramberî 1985'ê zayîni de, întîsarata Selheddîn Eyûbî bi navê "Nawenda Weşandina Tor û Edeba Kurdî" li bajarê Urmîyê damezirand. Her wisa ji kir û kiryarê çar salên vê navendê ra diyar e û her wisa ku hate gotin hegera herî girîng û ber bi çav ya damezirandina vê navendê xizmet bo weşandin û geşandina tor û edeb û çandîya Kurdî ye.

Yekemîn berhema vê navendê derînan û weşandina kovara "Sirwe" bû. Kovara "Sirwe" di bahara sala 1985'an de bi sernivîsakarî û jêr çavdêriya mamoste Hêmin bi sed rûperî bi zimanê Kurdî hate weşandin. Ev kovar heta du sala kovarek dangî bû, yanî salê 4 jimar derdiketin. Lê piştî hînga ser daxwaza xwendevanan û hewcetîya heyî "Sirwe" bû kovarek mehan e. Her wekî diyar e "Sirwe" kovarek edebî û ferhengî ye. Di vê kovarê de babetên edebî, şîir, çîrok, folklorê Kurdî, cografîya û dîroka Kurdistanê, nasandina zana, şîir, nivîskar û hunermendên Kurdistanê çî yê hevçax û çî yê pêşîn û babetên cûr be cûrê di yê edebî û ferhengî belav dibin.

Sirwe li sernaserî navçêd Kurdisatana Îranê belav dibe û digîje destê pişkek zor ji xelkê Kurdistanê û bi cûrekî ber bi çav ji layê xelkê pêşwarî lê tê kirin.

Li Kurdistana Îranê gelê Kurd

teze fêrî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî dibe, em têdikoşin ku "Sirwe" bi zimanekî sade û rewan bê weşandinê, da ku pişka zor a xelkê Kurdistanê bikaribin wêc(feyde) û behrê jê wergirin. Dikarim bêjim ku kovara "Sirwe" rola xwendîngeha Kurdî, mamoste û derbêjê Kurdî li Kurdistana Îranê diîze.

**Armanc:** Em dixwazîn bizanibin "Întîsarata Selaheddîn Eyûbî" çend pirtûkên Kurdî û yê nî ser Kurdan derxistîne?

**P. Cîhanî:** Bi giştî heta niha vê nawendê 21 pirtûk, bi rêza jêrin weşandiye û ji 25 pirtûkan zêdetir jî niha li jêrî çap û amadeyî çapê ne, ku emê navên hindêk ji wan pirtûkên belavbûyî ji xwendevanên xweşdivî yê kovara buhagiran Armancê re binivîsin:

- Pirtûkên weşandi:**
- 1- *Dîwana Nalî*
  - 2- *Dîwana Wefayî*
  - 3- *Dîwana Mehwi*
  - 4- *Dîwana Heqîqî*
  - 5- *Şarî wêran "Elî Hesenyani"*
  - 6- *Ferhengî Wişe Duwanekani Zimanî Kurdî "Taha Feyzîzade"*
  - 7- *Bîreeriyekanî Hanfêr (wergêr)*
  - 8- *Yaddaşthai Ez Kurdistan: Şêx Reûf Ziyayî bi koşîşê Umer Farûqî(Farisî)*
  - 9- *Kurd der Tarîxa Hemsayigan: Ewliya Çelebî(Wergêr Farûq Keyxusrewî(Farisî))*
  - 10- *Riyad El Salihin (Wergêr Ehmed Hewarî Neceb- Farisî)*
  - 11- *Mem û Zîn ya Ehmedê Xanî*
  - 12- *Ferhenga New Behar "Newbar" ya E. Xanî*
  - 13- *Xwendinî Kurdî(Koma nivîskarên kovara Sirwe)*
  - 14- *Destûrê Zebanê Kurdî: Ehmed Qazî(Farisî û Kurdî)*
  - 15- *Amraz di Zimanê Kurdî de: Dr. Îbrahîm Ezîz Îbrahîm*
  - 16- *Qamûsî zimanê Kurdî(A-B) rehmêtî Ebdurrehman Zebihî*
  - 17- *Karwanî Xayal. Dîwana mamoste Xalid Husamî*
  - 18- *Kurd der daîretul mearifê Îslamî: Wergêr Îsmail Fetah Qazî(Farisî)*
  - 19- *Feraîze Mele Ebdulhadî Ef-xemzade(Farisî)*
  - 20- *Zîndigname ê Arifê Rebbanî Şêx Şemseddîn Burhanî: Ebûbekir Xwançe Sipêhredîni(Farisî)*
  - 21- *Wenewşe: rehmêtî Mehemmed Sadiq Mehmûdî.*

Ev kitêbane jî amadayî çap û belewbûnê ne:

- 1- *Kafiyetûl Sibyan: Mela Mehemed Hesên Qizikî(Farisî)*
- 2- *Pendî pêşinyan: Ebdulhemîd Hîret Seccadî(Kurdî û Farisî)*
- 3- *Êla Milan: Perwîz Cîhanî (Farisî)*
- 4- *Haywa Kurkî Şivan; Wergêr Ehmed Mewlanî(Kurdî)*
- 5- *Dîwanê Şêx Ubeydullahê Nehrî(Farisî)*
- 6- *Silsile ê Neqşîbendiyê: Wergêr Rehman Mîsbah Qazî*
- 7- *Ferhenga Merg û ji ya mamosta Mele Xelîl Mişextî( bi Kurmancî)*
- 8- *Haware bere- Romanek Kurdî ye: Fettah Emîrî*
- 9- *Şêxê Senanê ya Feqiyê Teyran: Perwîz Cîhanî*
- 10- *Fêrbûna herdû rênivîsa "Latîn û Erebi" Perwîz Cîhanî*
- 11- *Komelek ji çîrokên Folklorî yê Kurdî - Nesrîn Caferî*
- 12- *Şeriyat: Hecî Hesên Karimî*
- 13- *Dîwana Mehemed Emîn Beledî Uşnewî (Farisî)*
- 14- *Dîwana Mele Mehemedê Cerihî(Farisî)*
- 15- *Beçkey Benyadem: Mela Mehemedê Rebbî.*

**Armanc:** Rast e, kovra "Sirwe" bi herdû zaravên serekî ên Kurdî "Kurmanciya bakur û başûr" derdikeve. Lê weku em dibînin beşê Kurmanciya bakur hindik e. Em dikarin egera vê çendê ji bizanibin?

**P. Cîhanî:** Her wekî em dizanin hejmara Kurdên ku bi zaravê Kurmanciya jorîn dipeyivin li Îranê li gor Kurmancên navîn gelekî kêmtir in. Hegera serekî a kêmbûna laperên Kurmanciya jorîn di "Sirwe" de ev e. Li hindêk egerên girîng û berbiçav yê din jî hene; yek ji wan egeran arîkarî nekirina torevan û qelem bi destên Kurmanc ên jorîn e. Niha gorekî hejmara beyî ji ser nivîsinên amator ji me re tî jî %95 nivîsin bi zarava Kurmanciya navîn e, tenê %5 nivîsin bi zarava Kurmanciya jorîn digîjine destê me, ku ew jî ji pîncê sê hêjayî weşandinê nînin. Ev herdû yê mayîn jî li hember babetên Kurmanciya navîn de zor lawaz û bi naverok in. Vêderê ez li vê derfendê (mecal) wêcê werdigrim û tewawî torevan û nivîskarên Kurd, ku bi zaravê Kurmanciya jorîn dinivîsin, daxwazê dikim ku kovara "Sirwe" jî ji xebatên xwe bi par û pişk nehêlin û di gelê vê kovarê, ku kovarek ferhengî-edebî ye û ji bo

Mamoste Perwîz Cîhanî di sala 1956'an de li gundê Belesora Jêrin, li navça Elendê, ser bi bajarê Xoy li ostana Azerbeycana Rojava ya Kurdistana Îranê ji dayik bûye.

Di sala 1977'an de li gundê Belesorê bû mamoste û 5 salan li wî gundî jî piçûk û mezînan re ders da û nêzikî sed û pêncî kesî li ber destê wî bûn xwendevan.

Du salan di sazûmana eşairî de li Xoyê û Mako yê kar kir.(ev sazûman jî aliyê dewleta Îranê jî bo hêjmartina koçeran û naskirin gelsên wan hatiye damezirandin) Di vê demê de ji peywendiyên xwe di gel radyo ya Kurdî li Tehranê bi helbestan xurt kir. Piştî û li ser daxwaza serokê pişka(beşê) Kurdî ya radyo ya Tahranê du salan di radyoya Tahranê û Urmîyê, di beşa Kurmancî de kar kir. Li radyoyê karê bêjerî(spiker) û nivîskariya du programan kir (fergenga gel, gulegeşên paşerojê).

Piştî damezrandina Întîsarata Selaheddîn Eyûbî li wir dest bi kar kir. Niha jî li vê navendê destyarê (alîkar) serokê koma nivîskara ye.

Sala 1978'an dest bi nivîsinê kir, gelek helbest û kurteçîrok û gotarên wî di kovara "Sirwe" de belav bûn. Her wiha jî hinek pirtûk û dîwanên wî ên çapnebûyî jî hene, mîna;

- 1- Pirtûkek li ser deb û risim û rewşa jîna Kurdên Azerbeycanê(350 rûpel- Farisî)
- 2- *Ax Şilêrok: pirtûkek helbesta ye li ser wezn û kêşaye (Heyder Babayê Selam şairê navdarê Azerbeycanê)*
- 3- *Înce Mehmed a Yaşar Kemal (wergêrandina Farisî)*
- 4- *Wergêrandina (Bûfê Kûr, kitêba Sadiq Hidayet bi Farisî)*
- 5- *Şengilok û Mengilok(Gur û Bizin) bi Farisî*
- 6- *Senem(roman)*
- 7- *Du çîrok bo zarokan(helbest)*
- 8- *Dara Azadiyê(helbest)*
- 9- *Merga Belengazan(helbest)*
- 10- *Komkirina pêtirî 3000 gotinên pêşyan ku hîn dom dike.*

**Berhemên wî yê çapbûyî û li ser çapê jî ev in:**

- 1- *Vejanîna Mem û Zîn ya Ehmedê Xanî-1986*
- 2- *Vejanîna Newbehar(Nûbar) a Ehmedê Xanî-1986*
- 3- *Êla Milan(li ser rewşa jiyana Êla Milan bi Farisî- li ser çapê ye)*
- 4- *Vejanîna Şêxê Senanî ya Feqiyê Teyran(li ser çapê ye)*
- 5- *Fêrbûna herdû rênivîsa(Latînî û Erebi li ser çapê ye)*

## HEVPEYVÎN HEVP

## SERÎ Û BINÎ YE"

tûrvedan(1) û weşandina tor û edeb û çandeya Kurdî dixebite, hevkarîyê bikin.

**Armanç:** Her wekî em dibînin, ji bilî kêmbûna laperan pişka Kurmancî ne ewqas tekûz e. Bo mînak hinek nivîsên lawaz û pîrr şasîtiyên rê-nivîsî her wekû xwe tene belavkirin. Çi dîtina we li ser vê çendê heye?

**P. Cîhanî:** Kêmek ji bersîva vê pîrsiyara te pêşda hate gotin. Em her cûrê rexne û qîle lê girtin û rê nimûniyên hîngo bi dil û can qebûl dikin û çavnehîriya me heye ku hûn û dîtir xwendevanên bi rêz û xweşdivî me li vê barê de rê nimûnî bikin. Lê xwezî te, bo nimûne, ji wan şasîtiyên rê-nivîsî du-sê yek ji me re dest nîşan bikira, da me bizanibiya kanî şasîtiyên me yên rê-nivîsî çi ne? Da ku careke din ew cûre şasîyane neyêne du pate kirin.

**Armanç:** Bo mînak, di hejmarek "Sirwe" de, li cîhê peyva "rûvî" we "rîvî" nivîsîbû. Bi dîtina min rastîya vê peyvê "rûvî" ye.

**P. Cîhanî:** Ya rastî ez van cûrê gote û peyvên bi zaravayî şasî nizamim, çimkî hê ji me re binecî nebûye kanê, bo nimûne, "rûvî" rast e yan "rîvî", yan "rwîvî". Di zimanê Kurdî de, xasma Kurmanciya jorîn de, dengê "û" ser du dangan "î" û "wî" belav dibe. Yanî di hindek zaravan de "î" û di hindekan de jî "wî" bi kar tînin. Bo mînak: Bilûl-bilwil-bilîl. Ya rastî ev hersê cûr bi kar anîn jî rast e, çimkî hêştta li zaravê Kurmanciya jorîn de, zaraveyekî nikariye serdestiyê di zaravê din bike û bi navê zaravê torevaniyê bi cûrekî giştî û hemû layên xwe nîşan bide. Niha em dibînin Kurdên Ûrisatê xwendin û nivîsandina xwe bi zaravê Beyazîdî ku zaravê Celalî çiçek ji wê ye, bi cî tînin. Li Kurdistana Tirkîyê zaravê Botanî, li Iraqê zaravê Badîni, li Îranê de zaravê Şikakî serdestî ji zaravên dîtir standine, ew jî ne bi cûrekî giştî û ber bi çav. Her çend ku zaravê Botanî di vê rêkê de pêşqedem û pêşeng bûye, lê hê jî torevan û nivîskarên me li hevnehatine û li ser zaravekî pêk negirtine, her kes hesiyê xwe diteriqîne û kes nabêje mastê min tirş e. Helbet ev gir û girifte di zaravê Kurmanciya navîn de jî heye. Di nav wana

de jî her kes berê çûkî ser xwe de radikêşe û hol diçe ber kaşoyê kijanî bi kêfa xwe lê didin.

Bi kurî ev hevîr wê gelek av hilde. Em hê nikarin bi vê astengiyê, bi sanahî û hêsani zimanekî yekgirtî yê edebî serrast bikin. Hêzek giştî dixwaze ku vê girifta girîng û vê aloziya ne veçirandî çareser bike. Ev ne karê du-sê nivîskar û torevanan, yan du-sê rojname û kovara ye.

**Armanç:** Çi dîtina we li ser nivîsina zimanê Kurdî bi tîpên Latîni heye? Her weha "Sirwe" di vî warî de çi pêngav avêtine?

**P. Cîhanî:** Bi ramana min zimanê Kurdî yê rê-nivîsa Latîni serrastir tê nivîsin ew jî bi mercekî ku tîpên.....bêne raçav kirin û ji wan re jî dirûşmên taybetî bêne serrastkirin û danan- her wekî hindek nivîskarên me vê hindê raçav dikin- hindek jî lêkoler û twêjkar û nivîskarên me li ser wê bîr û baweriyêne ku ev tîpên me gotî tîpên binbêşayî yên Kurdî ninin, lê veqetandina wan tîpane ji zimanê Kurdî ser sût û qazanca zimanê Kurdî nîneyek jî êdî çi hêz neşê û nikare van tîpane li zimanê Kurdî bistîne. Ev tîpane êdî bûne Kurdî, Kurd- karî tede hatine kirin. Bi sedan gote û peyvên Kurdî bi van tîpane hatine danan û teraşin. Ya rastî eva hezar û çar sed sal e ku zimanê Kurdî wekî zimanên dîtir Bisulmanên bilî Erebi, bi peyvên ayinî yên Erebi têkel bûye. Ev hezar û çar sed sale ku Zend û Avêsta û Meshefa Reş cîhê xwe dane Quranê- her çend ku hindek ji Êzdiyên me hê jî ayinê bav û bav-pîra ragirtine- lê mixabin ewana jî wekî berê nemane û bi gulekê jî nabe behar.

Erê, ev hezar û çar sed sal eku ferhenga me rê û şûn, rabûn, rûniştin, nivêj û taetê me minanî wan lê hatiye, eve hezar û çar sed sal e ku em miriyên xwe bi zimanê Erebi dispêrin axê, bûkên xwe bi zimanê Erebi bo zavayan mare dikin, navê Ereban li piçûkên xwe dikin û ji hemûya girîngtir rojê pênc cara, bi zimanê Erebi gazî baxoyê xwe dikin. Vêca ber van hindane komek zor jî gote û peyvên Erebi ketine nav zimanê Kurdî, ku veqetandina wan ji zimanê Kurdî ya bûyînî nîne. Teze

eger ya bûyînî be jî û em bikarin wan gote û peyv û tîpane ji zimanê Kurdî veqetandin û fire bidin! emê çi ji edebiyata xwe ya klasîk bikin!? Gelo kî hazir û amadeye ewê edebiyata me ya klasîk ku em şanaziyê pê dikin dest jê bikşîne! Kî hazir e dest ji şûne warên Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Nalî, Xanayê Qubadî, Mewlewî Tawegozî, Feqiyê Teyran, Qanî û hwd. bikşîne? Carekê, di kovarek Kurdî de ku bi tîpên Latîni hatibû nivîsin, çavê min bi vê sercemê ket: Helbestvanê Kurd "Qanî"!! Xudê, Qanî kî ye ku hê min navê wî nebihîstiye? Dema ku min serbuhîriya wî xwend, teze min zanî li bara "Qanî" daye.

Li bara rê-nivîsa ku em nihe kovara "Sirwe" pê dinivîsin jî kêmasiya usa berbiçav atuneye, her tenê kêmasiya ku di vê rê-nivîsê de heye nebûna nîşana dengê bizroke ye (l). Eger tuwêjkar û nivîskarên me jî vî dengî re jî nîşnaeyekê peyda bikin, bi ramana min ev rê-nivîsayî ji hemû rê-nivîsên dîtir ê Kurdî têkûztir dibe. Helbet bo wî dengî nîşaneyek heye ku mixabin her tenê li pişayîka peyv û gotinan de bi kar dibin, wekî: istran, istûn. Eger ev nîşane li nivêk û dûmayika peyvande jî bi kar bianîbûna çi kêmasî di vê rê-nivîsê de ne diman. Bo mînak: Li cîhê bizin ... binivîsandina biizin.....

Di vî warî de ji layê Întîşarat a Selaheddîn Eyûbî pirtûkek bi navê "Fêrbûna her du rê-nivîsan- Latîni û Erebi" amadeyî çapê ye, ku bi heskirina Xudê di sala 1990'an de bikeve ber destên xwendevana.

**Armanç:** Kovar û rojnameyên Kurdî, ku li Ewropayê bi tîpên Latîni derdikevin, pêwendîya we bi wan re çawa ye?

**P. Cîhanî:** Me di gel pişka

zor a kovarên Kurdî ên derveyî welat pêwendî heye, lê mixabin pêwendîya me û wan wisan nîne ku bikare pêngavên girîng li bara labirna gir û giriftên ferhengî-edebî de rake. Her tenê pêwendîya me û wan lêk guherîna kovar û weşana ye. Hêvidar im pêwendîya me di gel wan roj bi rojê di qonaxên bilind û girîng yên ferhengî-edebî de berfirehtir be û em bişên pêngavên herî bilind ji bo lêkvekirina alozî gir û giriftên ferhengî rakin.

**Armanç:** Ji wan kovaran re, çi gotinên te yê taybetî hene?

**P. Cîhanî:** Ez berî her tiştî pêşketina wan di hemû waran de, xasma di warê geşandin û weşandina ferheng û tor û edeb û çandeya rastî ya Kurdî de daxwaz dikim. Gotina min ya taybet ji wan kovar û rojnamen re eve ku; her wekî dizanin Kurdisatana Tirkîyê mezintirîn pişka Kurdistanê ye, di vê pişkê de bi sedan hunervan, folklorzan, nivîskar û şair û hwd. hene, ku destên Kurdên dîtir yên parçên Kurdistanê nagîje wan, hey-lo Kurdên wê pişkê jî belkû hay ji hebûna wana nebin, îca eve erka kovar û rojnamên Kurdî ye ku evan hunervanana û berhemên wan bi xwendevanan bidine nasandinê.

Her wisa niha em berê xwe didine laperên hindek ji wan kovaranan, pişka zor a laperên wan li ser doz û meselên ramyarî tene terxankirin. em nabêjin evê hindê ji bîr bikin, belkû li rex doz û meselên siyasî avirekî jî bidine meselêd ferhengî, edebî û nasandina folklorî. Derya ya bê ser û bine folklorê Kurdî. Niha li Kurdistana Tirkîyê ber bi mirçiqîn û têkçûn û çikyanî diçe, desthilatdariya zalimane ya hukumdara evê deryayê pê kanalên

cûr be cûr bo layê Turkî-zebûnê(Tirkîbûnê) radikêşin.

Niha pişka zor a istiranê Kurdî li Kurdistana Tirkîyê her tenê, lo lo û lê lê, lê mane. Wakî din hemû bûne Tirkî. Eva derbeka muhîm û tund e. Sened û belge ya her gelekî zimanê wî ye. Dijmin dixwaze evê senedê, evê belgeya înkâr nebûyî ji nav bibe. Em jî debê ku heta cîhê ku ji destê me bê li ber xwe bidin û xwe li ber tiqîşk û givişkan ragirin û bi xebata xwe mirazê dijimanan di çavê wan de bihêlin.

**Armanç:** Ji xwendevanên Armançê re we çi gotinên teybetî hene?

**P. Cîhanî:** Em dizanin zimanê Kurdî di pişka zore Kur-distanê de zimanekî pêşgirtî û yasaxirî bûye. Niha jî li pişka zore Kurdistanê nahêlin Kurdên me bi zimanê zikmakî bipeyivin û xebêrdin û gepkin. Daxwaza min ji tewawî xwendevanên xweşdivî yên kovara giranbuha ya Armançê eve ye ku hindî jî dest wan tê hev-welatiya hîni xwendin û nivîsina zimanê Kurdî bikin, heval û hogira, bi her wesîla heyî, bo layê xwendina zimanê zikmakî rakêşin. Her gava kovarek Kurdî yan pirtûkek Kurdî kete destê wan, bidin hevala jî, ji wan re jî şirovekin û wana bo hînbûn û hînkirîne han bidin. Her wisa daxwaza min ji xwendevanên xweşdivî eve ye ku ji bilî zaravê xwe dîtir zaravên Kurdî jî fêr bin û fêrî hevalan bikin, çimkî bi têkiliya zaravên binîşeî yên Kurdî zimanê Kurdî pê tekûz dibe.

Selah Berrwarî  
Sibat 1990  
Ormiye/Îran



Çend hejmarên kovara "Sirwe"

NEYNIK

Mehmed  
Uzun

## EM Û EWANA

Eger meriv bixwaze jiyane bi peyvekê salix bide, meriv dikare jê re bibêje lehî. Lehîyeke boş û xurt. lehîyeke ku her û her diherike, paqij û zelal e. Lehîyeke dirêj û bêser û bêber. Em meriv, bi gotina Kurdên Sovyetê mehlûqatên vê dinê, dilopên vê lehîya boş in. Em hem xwediyê lehîyê hem jî perçekî jê ne. Lehî em in, em bi hev re lehî ne. Tevger û yekîtiya dilopan esas û avahiya lehîyê ye.

Civat û jiyana civakî jî weha ye. Ew jî ji tevger, dan û standin û xebatên piralî tê pê. Em meriv, endamên civat û jiyana civakî, her di nav hin tevger, tevkarî û lebatan de ne. Li ser dinê tu meriv tune ye ku bi serê xwe û bi qîma xwe ye. Herkes bi hin şeweyan di nav hin celep tîkîlî, hevkarî û tevkarîyan de ye. Ev yek qayîdê civatê û jiyana civakî ye. Em meriv bê hevûdu nabin, em hewcedarê hev in.

Ev tîkîlî, dan û standin, tevkarî û hevkarî himê esasî yê mefhûm, zanîn û hisê gotina EM in. Gotina EM'ê li ser van ava dibe û bi van tîkîlî, dan û standin, hevkarî û tevkarîyan di civatê de netewe, gel, çîn, hêz û kom tîkîlî. Û meriv, yanî şexis dibe endamê netewe û gelekî, çîn, hêz û komekê. Meriv dibe dilopeke ji dilopên lehîya boş ku bê west û rawest diherike.

Di jiyana civakî de, her meriv di nav hin tevger û tîkîliyên EM'ê de ye. Yanî her meriv endamê hin EM'an e. Ji ber vê yekê, gava yek dibêje EM, hingê divê meriv baş guhê xwe bide mebesta wî kesî. Gelo kîjan EM? Bi çi şeweyî EM? Gotina EM'ê dikare her maneyê bide. Ew dikare bibe malbatek, komek, çînek yan jî neteweyek. Gelo kîjan EM û çîma?

\* \* \*

Berî niha bi çendekî, dostekî min ku alîgirê Enstîtuya Kurdî ya Parisê ye, gazinên xwe bi min kirin û gote, "malava, ma wekî te dibe? Tu hem berrisîyarê Kurmancî (\*) yî û dostê Enstîtuyê yî, hem jî alîkariya rûpelên çand û edebiyatê yên Kurdistan Press'ê (\*\*) dikî. Ma tu nabîni, ew çawan li dijî hev dinivîsin. Ma weha dibe. Hem bi ME re, hem bi WAN re..."

Ew dostê min niha vê nivîsara min ya pêşîn di Armanç'ê de bixwîne, bi ihtîmaleke mezin, ew ê weha bibêje; "Îşê vî Mehmed Uzun'î ne îşê aqila ye... eger meriv bêqayîde û bêprensîp be, aha weha dibe..."

Ez dizanim, ew dostê min dê tiştêkî weha bibêje. Ji ber ku li gora prensîp û qayîdên wî Enstîtuya EM in, lê belê Kurdistan Press ne EM in, Armanç jî ne EM in. Ew EWANA ne. Ew jî aliyê hin kes û baweriyên din diweşin...

Îcar li gora prensîp û qayîdên ku bi dilê min in, Enstîtuya Kurdistan Press, Armanç, kovar, rojname û avahiyên din yên Kurdî EM in. Ew hemû endamên ME ne. Ji ber ku berî her tiştî EM Kurd in, EM endamên neteweyê Kurd in.

\* \* \*

Di civat û jiyana civakî de gelek celeb EM hene; EM'a piçûk, EM'a mezin, EM'a mezintir û EM'a mezintirîn. EM'a herî biçûk malbat û famîlye ye. EM'a herî mezin merivahî (însaniyet) û netewe ye. Tarîxa merivahiyê û pêşketina civatan diyar kirine ku kom û civatên ku bi armanç û hedefên EM'a mezintirîn rabûne û dabûne pey wan, bi ser ketina û pîr caran EM'eke yekgirtî, mezin pêşketî, zane û perwerde ava kirine. Mesela Bismarkê Almanî, Garîbaldiyê Îtalî, Washingtonê Amerîkî, Bolivarê Amerîka-latinî bi armanç û hedefên EM'a mezintirîn rabûn, gelên xwe bi vî armanç, hedef û zanîne perwerde kirin û bi ser ketin.

Armanç, hedef û herweha bîr û zanîna EM'a mezintirîn bingehê neteweyekî yekgirtî û welatekî azad û neperçekirî ye. Heyama welat û netewebûnê bi şî'ûr, bîr û zanîna EM'a mezintirîn dest pê dike. Welat û gelên serok û rêberên ku min li jorê qal kirin, jihevketî bûn, mij û dûmana tarî ya nezanî, neçarî, berberî û dijminahiyê ji wan welatan radi-bû, zimanê wan ne yekgirtî bû, ji her serî dengê derdiket. Lê belê, bi xêra bîr û zanîna EM'a mezintirîn û xebata li ser wê riyê, welat û gelên Almanî, Îtalî, Amerîkî û Amerîka-latinî jî mij û dûmanê rû badan û berê xwe dan ronahiyê. Û wan bi vî awayî alîkarî û xizmet bi pêşketina merivahiyê û medeniyetê jî kirin.

Ji her welat û neteweyî bêtir welatê Kurdistanê û neteweyê Kurd hewcedarî şî'ûr, bîr û zanîna EM'a mezintirîn e. Ji her welat û neteweyî zêdetir Kurd divê alaya armanç û hedefên EM'a mezintirîn hil din. Ji ber ku dijminan bi neheqîyeke mezin civata Kurdî di navbera ol, terîqet, malbat, navçe, herêm, eşîr, zarava, îdeolojî û tevgerên teng de ji hev xistine. Ji ber ku di tarîxa Kurdan de, di warê yekîti û hevgirtinê de, valahiyek mezin heye û tecribên yekîtiyê, hema çî bigre, tune ye.

Loma EM'a mezintirîn di ser her tiştî û her celeb EM'ê re ye.

Armanç û hedefên EM'a mezintirîn divê bibin pîvanên her tiştî û her tevgerê. EM'ên biçûktir divê tu carî ji bîr nekin ku ew endamên EM'a mezintirîn in.

Bêguman, di nav EM'a mezintirîn de gelek celeb EM'ên biçûk hene. Li gora min, dan û standinên van EM'ên biçûktir mîna dan û standinên endamên malekê ne. Meriv dikare malbatê mîna prototîpê netewe bibîne. Malek jî ji çend kesan (bav, dê, zarok, law, keç...) tê pê. Û di malbatekê de jî her kes mîna hev nafikire û li ser rabûn û rûniştin, xwarin û vexwarin, lixwekirin û jixwekirin, tevger û lebatê dîtinên cihê hene. Bav guhê xwe nade zarokan û li malê xwedî dernakeve, dê li hatina malê nafikire û pir mesrefê dike, lawê mezin jî lixwekirin û ji lotikavêtinê pê ve li tû tiştî nafikire, keça nazdar û şermok ya malê jî ber neynikê ranabe û alîkariya diya xwe nake, lawê biçûk, hemû mal jê bêzar mane û hwd... Lê di gel van yekan, ew hemû endamên malê ne, mensûbên wê malê ne.

Ji ber vê yekê, bi bawerîya min, Enstîtuya Kurdî jî, Kurdistan Press jî, Armanç jî zarokên mala mezin in û mensûbên EM'a mezin in. Ne xem e ku ew jî hev cihê difikirin û li ser gelek bûyer û gelşan ne wek hev in. Di malekê de herkes wek hev nabe û wek hev nafikire û jî şivekê eynî tahmê nagire. Lê ya girîng ew e ku şîva malê li ser êgir be, jiyana rojane bê qeza û bela dewam bike û silamet û pêşeroja malê di ser her tiştî re be û ji bo vê yekê, di navbera mensûbên malê de li hev guhdarî kirin hebe...

Loma gava em dibêjin EM, em li ser EM'ê bifikirin û pêşengiyê bidin EM'a herî mezin.

\* Rojname Enstîtuya Kurdî ya Parisê ye, li ser mesele û problemên zaravayê Kurmancî radiweste.

\*\* Rojnameyeke duhefteyî ye, li Stockholmê, bi Kurdî û Tirkî diweşe.

ZERDEŞTÊ  
BUHARÊ

Bo Zekîya ALKAN

"Te çawa ev agir tev  
Di kezeba xwe de haşkiribû?!"  
\* \* \*

Şev şîna şîna dîke  
Hedan hêvîya hîn dîke  
Bahoz buharê bîn dîke

1

Şeva bê kelek...  
Tu!!  
Pêlek ji birca belek...  
Û pitpita bayê felek...

2

Gulên çav har  
Di porê te, derizîn...  
Movikên çaxê,  
Poşmaniya qonaxê,  
Bexçên dayaxê,  
Di astenga xewnê de, lerizîn...  
Tu!!  
Biyaniya şor, azadiya zuha,  
Bazdana reha,  
û, bi ta vekirina meha,  
Ji vîkvîka xwînê dipengizîn...

Çavên bê kevok.  
Bê gezo û bîhok.  
Agirê pîr.  
Agirê ku ji qidum diket...  
Agirê ku di cejnê de  
Di nav pêçeka herdu lêvên te de raket...

3

Girî li ser dara sibehê.  
Rojhilat û toza gunchê.

Giyayên geş mîna şîniyê.  
Çîrên vemirtî mîna xweşîyê.

Tu!!  
Bayê ber tavê.  
Bajarên ku xwe li ba dikin...  
Sînorên ku goristanan li hev par dikin...  
Stêr ku xwe bi ser kenê te de xwar dikin...  
Tu û buhar,  
Ku guregurê di hêfîna evînê de şiyar dikin...

4

- Welat ku hat  
Tîpên xwe di agir de ji bîr kir  
Destan bi baskê "FERAT" zencîr kir  
- Welat ku hat  
Ewrên buharê kir hêsir  
Çiya ji xwînê re kir pêsir  
- Welat ku hat  
Birûsk ji kalanê avêt  
Şîra koç û konan mêt  
- Welat ku hat  
Dereng di jîne de rizya  
Dereng şîna sahf za  
û, tu!!

û welat... qebqeba kewan dînoşe  
û welat... li ser kêlan gula reş e  
û welat... pêlên sor didrû  
û welat... ku wê sibhê  
te dabu dû  
û welat... pişkoka tîrsê hil dîke  
û welat... sonda te bi agir kil dîke  
û welat... kela berfê himbêz dîke  
û welat... şehîdan di tavarokê de rêz dîke

û tu!!  
Li welat kerr û gêj bû...  
û welat... di reşka çavên "DIYARBEKIR" de  
gelawej bû...

Te berê xwe dayê  
û tu!!  
û tu,  
bi hêsrên Kurdistanê bi desmêj bû...

EHMED HUSEYÎ  
30. 4. 1990



**Serokê Komela Mafên Mirovî ya Diyarbekirê Hatip Dicle:**

**Li heremê bêqanûnî û zordariya kêfî li dar e**

Roja 2. 8. 1990 Serokê Komela Mafên Mirovî ya Diyarbekirê Hatip Dicle, li ser êrişên leşkerên Tirk ên li ser gundiyên herêma Kercewsê, raporek eşkere kir. Di raporê de wiha tê gotin:

Li ser xebera ku Hêzên Ewlekarî yên Dewletê li gundên Ardiçli (Açip) û Yayladûzû (Gundik) ên bi ser qeza Kercewsê ya Batmanê ve îhlaliya mafên mirovayî dikin, roja 28'ê Tirmeha 1990'an di serokatiya endama Komîta Îdarî ya komela me Nazdar Yeşil û endama komîsyona huquqî Av. Husniye Ölmez de heyetek hat pêkanîn û wê heyetê li gundên ku nawên wan derbas bûn lêkolînek kirin.

Li gor tespîtên heyetê:

a) Bi bahana rûdanekê li derûdorên gundê Yayladûzûyê (Gundik) di 28. 7. 1990'an de Hêzên Ewlekarî yên Dewletê li gund operasyonêk kirine û di operasyonê de jin û mêr, hemû gundî bi hev re li ciyên cihê cihê hatine komkirin, ji serê sibê heta êvarê li ber rojê hatine rawestandî, mêr gelek hatine îşkencekirin, tehdîta wê yekê hatiye kirin ku divê gundî zûtîrîn gundê xwe vala bikin yan na wê gund were bombekirin. Gava heyet ketiye gund, tespît kiriye ku gund bi tevayî hatiye valakirin, di wê gavê de rastî

pîrejinekê hatine ku di mala xwe de bûye. Gava pîrejin rastî nûnerên heyetê hatiye, bi tirs û xof pirsîye ku "Ma hûn merivê hukumetê ne? Hûn bi Xwedê dikin bibêjin, ma gund wê bê bomebarankirin? Ev pirs bi xwe jî mezinayîya buyerê nişan dide. Di netîca lêkolîna xwe de heyetê tespît kiriye ku li hemû malan, alavên malê hatine belawelakirin, ebûra gund ku bîstan in hemû jî bêxwedîtiyê zer bûne û gundiyan hemû barkirine Batmanê; bajarê herî nêz.

b) Gundiyan Dirêfê jî ku gundekî wê heremê ye dane xwiyakirin ku Hêzên Ewlekarî yên ku operasyon anîne ser gund, îşkence bi wan kirine, şertê jiyana wan gelek zehmet bûye, ava wan a wexwarinê jî tune ye, û bi wê yekê tîrîn mecbûrkirin ku bar bikin.

c) Heyetê li gundê Ardiçliyê (Acipê) jî lêkolîn kirin. Li gor lêkolînan derketiye ku muxtarê gund Nûrî Erîn jî alî Hêzên Ewlekarî yên Dewletê ve di operasyonê de hatiye binçavkirin, ji ber îşkencên ku lê bûne piştî hatiye berdan jî demekê li Nexweşxana Dewletê ya Batmanê tedawî bûye. Gundiyeke extîyar yê her wî gundî bi xwe; Cemil Ekmen jî li gund lédan xwariye, du diranên wî hatine şikandin û jî

ber ku nayê zanîn ka bi ku de hatiye birin, ji heyata wî tê endîşe kirin. Ji bo ku dora mala muxtêr hatiye girtin mûmkûn nebûye ku heyet muxtêr bibîne. Bi bahana ku têkilîyên wan bi bûyeran re hene li Batmanê hin kes hatine girtin ku endamê komela me M. Emîn Ekincî jî di nav de ye.

Ev karûbar hemû nişana wê yekê ye ku piştî Biryarnamên 424 û 425 dewletê polîtîka êrişkarî û çavtirsandinê ya bêhuquqiyê daye ber xwe.

Bi bahana ku li nêzî gund bûyer bûye, li hemû gundiyan bi çavê sucdarên potansiyel tê nihêrtin, û îşkence û muamelên wiha nemirovayî li wan tîrîn kirin, tîrîn mecbûrkirin ku dev ji gundên xwe berdin û bar bikin. Ev nişana wê yekê ye ku li ciwarên gundîtiyê yên heremê serdestî ne îhtîrama mafên mirovayî ye lê bêqanûnî û zordariya kêfî ye.

Divê bê zanîn ku karûbarên zulmdarî yên wiha ne ku xizmeta aştiyê, biratiyê û huzûrê dikin, bi eksê vê xizmeta gijbûna nerihetîya siyâsî dikin. Em van îhlalên mafên mirovayî bi şiddet protesto dikin ku maf û azadiyên esasî binpê dikin, em bala berpirsiyaran dikşînin ser vê yekê û bi riya çapemeniyê daxwaz li raya giştî dikin ku li ser van bûyeran hişyar bin.

**Li Yekîtiya Sovyetan: Fîlmê Yekemîn bi Kurdî**

Gelek nivîskar, sinemakar û hunermendên Kurd gelek karên mezin pêkanîne, lê mixabin ne bi zimanê Kurdî ne. Yanî dema ku gotin tê ser sinemayê hema navê Yilmaz Guney tê bîra mirov, lê gelo kî Yilmaz Guney wekî hunermend u şînemakerekî Kurdî dihesibîne. Kes nahesibîne ji ber ku, fîlmên wî ne bi zimanê Kurdî ne.

Berî salekê dema ku li Swêdê Yekîtiya Sinemakarên Kurdisanê (YSK) hate avakirin, me gelek hêvî pê va girêda û em li benda karekî wan bûn ku me pê şa bikin.

Bi rastî jî îsal di meha Adarê de, li Komara Kazaxîstana Sovyetiyê komek sinemakarên Kurd ji Swêdê û hin sinemakarên Sovyetî dest bi çêkirina filmekî kirin bi navê (Keriyek Gur).

Senaryoya wê Mihdî Umêd nivîsand, li ser esasê romana nivîskarê Kurd Husên Arif ya bi zaravê Soranî.

Rejîsor jî aliyê Kurdî ve Têfur, ji aliyê Sovyetî ve A. T. Aşrapov bûn.

Alîkarê Rejîsor jî aliyê Kurdî Fathî u ji aliyê Sovyetî B. İskakov bûn.

Operator jî aliyê Kurdî Ezîz, ji aliyê Sovyetî A. K. Musayev bûn.

Dekor: R. Kerîmov Serokê derxistina fîlm M. C.



Mehdî Umêd di fîlmê "Keriyek Gur" de

Moxamêcanov di film de rolên pêşîn Mehdi Umêd û artîsta Sovyetî Anna Semuxîne û du zarok; Saşa u keça Kurd Zarîne dilîzin.

Fîlm li ser çiyayê Tîyan-şan û di studyoyên Kazaxîstanê de hat kişandin. Montaja wê li bajarekî Sovyetî wê çêbikin.

Xeberdan bi zimanê Rûsî û Kurdî (Soranî) ye. Cara pêşîn bi zimanê Kurdî û li ser navê filmekî bi pişkdariya Kurdî-sovyetî tê girtin. Heqê firotinê di destê dewleta Sovyetê û

YSK li Swêdê da ye.

Xwendevanên delal û hêja kanî em giş spasîyê pêşkeşî wan kesan bikin ku li ser çiya di nava berfê, baranê û bê de bi çetînayî cara yekemîn filmekî Kurdî yê çirokî derxistin.

Em tev bi hêvî ne ku di demek nêzik de li ser perda mezin temaşa filmekî bikin ku bi zimanê dayikê dileyize.

Nûçegîhanê me yê Kazaxîstanê Pêrîşanê Efrînî

**Hindik-Rindik**

**Sonda xwe bi cî anî**

Yekî Ereb lokê-devê nêr- xwe wenda kiribû. Devê wî bi kêmasî hezar qurîş dikir. Ji xwe re sond xwar, got: - Heger ez bibînim, ezê wî bibim mazatê û bi quruşekî bif-roşim.

Pirr derbas nebû deveyê xwe dît. Ji bo ku sonda xwe bi cî bîne rabû pisikek guhkurmî girt, kir torbaki û torbe jî bi hustiyê lok ve kir û lok bir mazatê. Li mazatê bi dengê bilind bang kir, got:

- Lok bi quruşekî, pisik bi 999 qurîşî! Her du bi hev re bi hezar quruşî.

Cambazên mazatê lê kom bûn, di nav xwe de bû kurepista wan, gotin:

- Welleh lokî erzan e... ne ev bêxwedîya pisika guhkurmî buya.

**Sûretê bizina wî tê ber çava**

Nabîyê şair ê Ruhayî avêtibûn hefsê. Di hucra Nabî de gundiyeke jî hebû. Nabî, li ser halê xwe, li ser jiyana hefsê her roj şîrê nivîsand û şîrên xwe ji mêrikê gundî re; ji hevalê xwe yê hucrê re dixwend. Her cara ku Nabî şîrê dixwend, yê gundî jî li ber, kûr-kûr digiriya. Nabî rojekê meraq kir, got:

- Bira, her cara ku ez ji te re şîrê dixwînim tu xwe ranagrî û digrî. Ma qey şîrê min pirr bi tesîr in?

Mêrikê gundî bala xwe da riya Nabî ya têt-têfî û got:

- Begefendî, giriyê min ne ji ber wê yekê ye. Li gund bizînek min hebû, riya wê jî e'ynî wek a te bû. Her cara ku tu şîra diwxînî sûretê bizina min a dema ku kayika xwe dike tê ber çavê min; lema jî dilê min xera dibe û ez digrîm.

**Newala Jêr**

Kera mêrikê Surguçî wenda bûbû, ew û lawê xwe li çolê pan bûbûn, her yek ji alîkî de lê digeriyan. Piştî demekê lêwîk ker dît û deng li bavê xwe kir, got; "bavo were, vaye min ker dît."

Bavê li lawê xwe vegehand, got:


- Law, hey carê ez te'ibime -westiya me- ev newala jêr tenê maye, hema ezê herim li wê jî binêrim

Amadekar: Z. Xamo

**Di musabaqa bokse ya Şampiyoniya Ewropa de**

**Kurdek bû şampiyon**

Di musabaqa bokse ya Şampiyoniya Ewropa de ku di Tirmeha 1990' an de li Çekoslovakayê pêkhat, Kurdekî Gurcîstana Sovyetî bi navê Kako Beravî (Kaxeber Beravî) di nav kesên di salên xwe de bû şampiyonê Ewropa û xelata zêr wergirt.



Kako Beravî

Kako Beravî berê jî di Musabaqa Nisana 1990 an de jî ku li Stenbolê çêbûbû, bi dereca yekemîn xelata zêr wergirtibû.

Kako xortekî Kurdê Tîblîsî ye, jî malbatek sporhez tê. Wî di piçukayîta xwe de dest bi sporê kir. Hîn 15 salî bû li bajarê Livovê beşdarî musabaqa bokse bû. Di vir de dereca wî bû ya duduyan. Jê pê ve li nav Yekîtiya Sovyetan beşdarî gelek musabaqan bû. Piştî jî tevî musabiqên navnetewî bû.

Em hêvîya serkeftinên mezin dikin ji bo Kako Beravî.

## Yew Kitabê Bîbliyografya: LES KURDES ET LE KURDISTAN Bibliographie critique 1977-1986


Joyce Blau, *Les Kurdes et Le Kurdistan, Bibliographie critique 1977-1986*, Tahrân-Paris, Institut Français de Recherche en Iran, 1989, XVII+147

Herçiqas ki ser o 1989 nusiyawo zî, kitabê Joyce Blau yo bi nameyê Les Kurdes et Le Kurdistan-Bibliographie critique 1977-1986 (Kurdi û Kur-distan-Bibliyografya ya kîrîki 1977-1986) emser -1990- neşr bi. No kitabê bîbliyografya, kitabêdo baş o.

Kesê ki mesela Kurdan û ziwane Kurdkî ser o xebitiyênî, sewbî kitabane ya ra zî Joyce Blau şinasnenê. Xanima Joyce Blau, Paris di, Enstituyê Millî yê Ziwane û Medeniyetanê Rojhelatî (L'Institut National des Langues et Civilisations Orientales) di dersdar (mu'alim) a.

Kitabê Les Kurdes et Le Kurdistan'î di, bê xeyra Joyce Blau nuştayê (yaziye) nê kesan -ki vêşaneyê jîni univêrsîte û enstituyan di ders danê - zî estê:

- Emir Hesenpûr (Kanada)
- Ehmed Kerimi-Hekkar (Universîteya Waşingtonî)
- Ebdullah Merdux (Paris)
- Angelo M. Piontose (Universîteya Roma)
- Bernard Hourcade (CNRS, Paris)
- Christine Potier (Paris)
- Dominique Ferrandini (Paris)
- Gilbert Lazard (EPHE, Paris)
- Helkewt Hekim (INALCO/ Dersdayoxanê Enstituyê Millî yê Ziwane û Medeniyetanê Rojhelatî yê Parisî ra)
- Jean Calmad (CNRS, Paris)
- Jean Daring (CNRS, Paris)
- Jean-Pierre Digard (CNRS,



Paris)  
-Pierre Lecoq (CNRS, Paris)  
-Paola Orsatti (Universîteya Roma)  
-Wolfgang Behn (Berlin, Federal Almanya)

Nuşte yê ki nê kitabî di yê û semedê dayışşinasnayîşî amey nuştîş, hîna verî -miyanê serranê 1977-1986'î di- des cîdanê verênanê mecmuaya Abstracta Iranica di neşr bibî. Kitabê Les Kurdes et Le Kurdistan'î, bi ziwane Frenskî yo û te de tanî kitab, mecmua, gazete û meqaleyê ki Kurdan û Kurdistanî ser o yê, yan zî Kurdkî yê, amey şinasnayîşdayîş. Nê nuştan di, derheqê 450 kitab, gazete, mecmua û meqalan di hagîdarî amey dayîş. Yanî kitab di, tenya bibliyografya nê, labelê derheqê kitabane di tay hagîdarîyê binî zî ca gênê. Bi ayhewa ge ge derheqê behsanê miyanê tay gazete û mecmuayan di zî hagîdarî amey dayîş.

Xusûsiyetanê muhîmanê nê

kitabî ra yew zî no yo ki, te de tay tezanê lisans û doktorayan -ki univêrsîteyan di amey nuştîş- ser o hagîdarî ameya dayîş.

Kitab û gazeteyê ki no kitab di behsê yîni biyo, bi ziwane Almankî, 'Erebkî, Fariskî, Frenskî, İbranîkî, İngilizkî, İtalîkî, Kurdkî, Oriskî û Tirkî amey nuştîş û nê şarisanan di neşrbiyê: Amsterdam, Ankara, Bexdad, Berlin, Beyrût, Bonn, Cenevre, Erîvan, Frankûrt, Hambûrg, Hewlêr (Erbîl), İstanbûl, İzmîr, Krakov, Kûdus, Leiden, Lenîngrad, Londra, Los Angeles, Lozan, Mehabad, Meşhed, Moskova, Munîh, Napoli, New York, Paris, Roma, Senendec, Stokholm, Silêmaniye, Tahrân, Tebrîz, Uppsala, Ürmîye, Viyana, Zurich.

Les Kurdes et Le Kurdistan di, Kurdistanê Vakurî (Kurdistanê Tirkîya) ra behsê kitabane nê nuştexan zî biyo: Abidin Sönmez, Awê Balî, Brîndar, Firat Cewerî, İhsan Aksoy, İhsan Nûrî Paşa, Kendal, Mahmut Baksî, Mamoste, M. E. Bozarslan, Mehmet Uzun, Nureddin Zaza, Rohat, S[eyid] Alp.

Peyniya kitabî di yew îndeks esto ki te de nameyê kesan, gazeteyan û mecmuayan estê. İndeksî ra pey zî indeksê behsan (répertoire thématique) ca gêno.

Bi nê xusûsiyetanê xwi, Les Kurdes et Le Kurdistan-Bibliographie critique 1977-1986, kitabêdo Frenskî yo erjaye wo.

M. Pîran

## Lawikanê Dêrsîmî ra

### ZERÊ MÎ

Arêkerdax: FİRAT

Er erê, zerê mi, zerê mi!  
Xizirê sata tenge key bojiyê tu ano keno binê sarê mi?  
Wer erê, dewa sima ver de lewa teke,  
Mi ver a selam ro mo û piyê mi ke.  
Ez ke memleketê vesayî de mirenû,  
Porê a delale biya binê mezela mi ke.

Erê, derd o, zerê mi, zerê mi!  
Çayê herediya, bojiyê ho nîkena binê sarê mi?  
Er erê, zerê mi, zerê mi!  
Xizirê serê deyray key bojiyê tu ano keno binê sarê mi?

Er erê, dewa sima ver a hêgao bez o.  
Xizirê serê deyray naye be ho zano.  
Er erê, çimê mi to de mendo.

Er erê, zerê mi, zerê mi!  
Çayê herediya, bojiyê ho nîkena binê sarê mi?  
Er erê dewa sima ver de be gavan o,  
Piyê tu, tu mi nêdano, zerê mi.  
Dilegê mi ke Haqo talay de vêreno.  
Û (O) çira cêno seytan ver de xizmet vîno

Da dayê, bî ra, vêra son o.  
Taye îsan zekerîni vèreno.  
Bira tu ke na bantê mi memleket de cinena,  
Muzir Baba to de qîlba beno,  
Haqo tala to de heval beno.

band: kaset  
be: bi, ve  
bez: beji, çiyô bêaw (hêgao bez: hêgawo beji)  
biya: biyari, beri (beeri)  
bî ra: bî, bi  
boji: boju, bazi, bazû  
cêno: gêno  
cinayîne: cenayîş  
çayê: çî rê, çî rî, çî ra, çinay rê, çina ra?  
çira: çila, çiley  
de: di, dir, der  
deyra: derya, dengiz, behr, bahr  
dilege: waştîş (Tirkî di: dilek)  
erê: herê  
herediyaîne: celiyayîş, cigriyayîş, hêrs biyayîş  
heval: hambaz, embaz, imbaz, 'emaz, enbaz, inbaz, 'imaz, ombaz  
îsan: însan, însan, mêrdim, merdum, mordem  
ke: ki, ku, gi  
lewa teke: leya teki, yew ley  
mezele: tirbi, qebri  
Muzir Baba: Munzur Baba  
na: nê, nî, enî, inî (naye: nay, enay, inay)  
qîlba: qible, qelbi  
sare: sere  
sate: se'eti  
selam: silam  
seytan: şeytan, şeyton, şeyto, şeytû  
sima: şima  
son: şan, şon, san  
taye: tanî, tonî, tay, toy, tûy  
tu: 1)to, 2)ti  
û: o, we; aw, ay  
vezeno: veceno, vejeno  
vêra son o: vera şanî yo  
vînayîne: vînayîş, veynayîş  
zerê mi: zera mi, zerîya mi, waştâ mi

### ŞÊX Û MELA

Gelê xalûn, apûn, dezûn!  
Ma bî yêşîr, mendî nezûn.  
Ma nişt herûnd', şar kowt fuzûn,  
Ma hê kaş a, şar kowt duzûn.  
Heywax, mi ra, heywax, mi ra!  
Zemûn xirab, ez bimira!

Ey Xala Gulê, Xal mi Hesol!  
Şêx û mela kenî parsûn,  
Fitr û zikat xwe r' ken hîsse,  
Çar gûmî vazdên, şin dizdê.  
Heywax, mi ra, heywax, mi ra!  
Zemûn xirab, ez bimira!

Ey Xala Xum, Xal Remezûn!  
Şêx û mela weş donî we'zûn.  
Gêrên perûn, zikatûn, bizûn.  
Gêrên zergûn, mîyûn, kuzûn.  
Heywax, mi ra, heywax, mi ra!  
Zemûn xirab, ez bimira!  
Ey şêx mino feqçolaxo!

Kom beno İslûm pey ehlaqo?  
Kirdî mird nêwen nûn û tueraqo,  
Tue r' nîm leşo yew boraq o.  
Heywax, mi ra, heywax, mi ra!  
Zemûn xirab, ez bimira!

Ey şêx û melawo rilişte!  
Şima hê kenî komî r' nuşte?.....  
Heywax, mi ra, heywax, mi ra!  
Zemûn xirab, ez bimira!

Ti se ra şin, ti se ra şin?  
Ti cezmi kwenî, hewa ra şin.  
Şêx hê vernî d', ti dim a şin.  
Tu ken sê pird, tu ser a şin.  
Heywax, mi ra, heywax, mi ra!  
Zemûn xirab, ez bimira!

1975  
K. SİNDAN


Hevalo,

Te ji bo Kurdistanek serbixwe û azad canê xwe feda kir. Tu ji bona me sembola, têkoşîn, liberxwedan û serbilindiyê yî.

Em hemû hevalên te li ber xatira te bi hurmet û bi giramî te bi bir tînin.

**Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan Komîta Swêd**

**M. Nuri Madak (Azad)**  
(1954 - 16. 09. 1983)



**Bedirxan (Zeki Aktaş)**  
1963 - 01. 08. 1990

Ger rojekê çiyayên me jî ruyê buharê bibînin, emê qevdek kulîlkên ji erdên me serîhildayî çêkin û deynin ber serê te.

Suleyman Akkoyun  
A. Halim Aktaş  
Zekertiya Çelik  
Ata Ala  
Mustafa Aydoğan

## Çareserkirina pîrsa Xelîc ê...

Destpêk r. 4

din hene ku gelek welatên Rojhilat û yên herêmê jî di mesela şer de bê dil dikin.

Yek jê ew e ku bi vê buhranê rola Amerkka di herêmê de wiha xurt bûye ku ne tenê welatên Rojhilat û hinên herêmê, hin welatên Ewropa bi xwe jî ne razîne. Derketina şer û xistina rejîma Iraqî di riya şer de wê Amerîka bi temamî bike hakimê herêmê. Sovyet, Çîn û Japonya jî tê de gelek welat vê yekê zû bi zû qebûl nakin û gelên herêmê jî wê vê rolê danequrtînin.

Ya duduyan buhranê bi xwe re rola hin welatên herêmê jî xurttir kiriye. Gava şer derkeve ev welat wê nifûza xwe ya di herêmê de li dijî gel û welatên cîran bilindtir bikin. Di serê van welatan de Tirkiye tê. Bi buhranê re dîsa qîmeta Tirkiyê(ji bo ku cîranê Iraqê ye, di NATO de ye û ji ber hin sedemên din) li ber çavê Amerîkî û Ewropîyan wiha bilind bûye û alîkariyek wiha li Tirkiyê dikin ku ji aliyê din Sovyet û welatên Erebbî mecbûr dibin hê bêtir wê bigrin hesab û gelek daxwazên wê bi cih binin.

Ku Amerîka dest bi şer ke welatê duduyan ku têkeve şer Tirkiye ye û ji bo şer jî di ciyekî gelek stratejîk de ye. Bi vî awayî bilindbûna tesîr û nifûza Tirkiyê, Sûriye, Îran, Kîbrîs, Yunanîstan û Bûlgarîstan tê de gelek welat nêrehet kirine. Xetera Tirkiyê li ser ewlekari û hukumraniya wan bilind bûye. Ew na-xwazin rola Tirkiyê bi vî awayî di buhrana Xelîc de bilind bibin, loma jî ne piştgirê şerê leşkerî ne.

Şerê leşkerî, ji alî hemû sedemên jor û bi taybetî ji alî sedemê herî dawîn ne li gor berjewendiyên gelê Kurd e jî. Gava ku şer derkeve û Tirkiye têkeve şer herdu perçên Kurdistanê wê bibin qada giraniya şerê dijwar. Çêkên kîmyayî jî tê de wê her awe çêkên bîkaranînin. Kurdistan di şerê wiha de wê bibin welatekî wêran. Bi vî jî namîne, gava rejîma Iraqî bi şerê çêkdarî û bi giraniya Tirkiyê bikeve, piştî şer Tirkiye rê nade ku Kurdên Kurdistanê Iraqê bibin xwediyê tu mafî. Ji xwe di şerê wiha navnetewî de rola şerê çêkdarî yê Kurdan wê gelek kêmbin, heta kare tu nemîne jî. Gava wiha be piştî şer kes guh nade doz û mafên gelê Kurd, wê daxwazên Tirkan bi cih binin.

Lê di rewşa îroyîn de wiha lê hatiye ku dinya dikare, bêyî ku pêrgiyê van hemû rîskan bibin, têkoşînek xurt li hember rejîma Seddam li dar xe û rejîmê bixîne. Ew jî ew e ku bi rastî biryarên NY bînin bicîhkirin, ambargo û abluqên aborî, siyasî, dip-

lomasî û leşkerî bînin ser Iraqê bi şertê ku ji alî din de, alîkarî û piştgiriyek maddî, leşkerî, siyasî û diplomatîkê bînin dayîn ji bo tevgera netewî ya Kurd û Erebbî a nav Iraqê. Muhawele bi her awayî bînin kirin ku rejîm di riya şerê hundurî bi têkoşîna gelê Kurd û Erebbî hilweşandin.

Gava rejîm bi têkoşînek wiha bînin xistin ew hemû rîskên maddî û manewî jî wê neyên holê û wê gelên Erebbî û yên musulman hîs nekin ku bi şerê wan hatiye listin. Ev her wiha tercîhkirina çareseriyek herfî bi şerê û ihtîram e jî.

Ya herî girîngtir ew e ku ev tercîh, wê rê li ber avakirina rejîmê wiha veke ku, li gor menfeeta hemû gel û welat û rejîmên herêmê û yên cîhanê be.

Îro ji bo Amerîka, Rojavayîyan, Erebbî, Îsraîl, Îranê û gelek welatên din ya muhîm ew e ku Iraqê bibin dewletek wiha ku çêkên kîmyayî di dest de tunebin, îmkana çêkirina çêkên nukleer pê re nemîne û tucarî nebe tehdîd li ser welatên Erebbî, li ser Îsraîl û cîranên dîtir, nikaribe êrişê bibin ser wan û gefan li wan bixwe. Dewletek wiha, herî realisttir di riya çareserkirina pîrsa Kurdî de kare were holê. Bi vî gelek daxwazên din jî wê bi cih bibin ku dinya hemû pê razî be. Ji bo vî jî:

1) Divê dewlet û rejîmek wiha bînin avakirin ku, hukum bes ne di destê Bexdeyê de be, bes ne di destê Erebbî Iraqê de be, bes ne di destê partiya BAAS de be. Divê berî her tiştî, hukum di navbera mîletên Erebbî û Kurd de wek hev bînin parvekirin, merkezek Baxda be û yek jî li Kurdistanê be. Ev herî çêtir di riya dewletek federal de kare bînin pêkanîn ku ji du mîlet û welatan pêk bînin, du parlamentoyên mîlî û parlamentok ji mîlet û eqelîyetên Iraqê pêkhatî bînin avakirin. Helbet daxwaza cihêkirin û serbixweyiya Kurdistanê îro di nav welatên Erebbî de û ji alî welatên din ên cîhanê ve wê neyê qebûl kirin. Loma meriv dikare bêje ku wê ji bo îro ne realist be. Lê daxwaza avakirina yekîtiyek federal ku ji du

cumhuriyetan pêk bînin, piştî ku wê tu erdî ji Iraqê cihê neke kare ji alî Erebbî ve bînin qebûl kirin. Çimkî gava di yekîtiyek wiha federal de Kurd jî qasî Erebbî xwedî par û biryar bin, wê Kurd tu carî qebûl nekin ku Iraqê ber bi hêzbûna Erebbî hudûdê xwe fireh bike, yan êrişê bibin ser welatekî Erebbî yan cîranekî din. Di karekî wiha de ji bo ku wê Erebbî xurt bibin û Kurd zêff bimînin, ne mumkûn e ku Kurd siyasî wîha êrişkar û hegemonîxwaz qebûl bikin. Ev dibe ewlekariyek bi îstûkkar a dûtir û dirêj hem ji bo welatên Erebbî, hem ji bo Îsraîl û cîranên dîtir.

Ji alî din divê rejîmekî demokratîk yê pîrpartîdî bînin danîn, ordî, polis, istixbarat û burokrasiya dewletê hemû jî bin lepê BAASê bînin derxistin, BAAS jî bibin partiyek wek her partiyê bi hîlbiartinan were ser hukum û ji hukum here. Divê hejmarê ordiyê bînin daxistin, bi peymanek navnetewî çêkên kîmyayî bînin qedexekirin, parlamentîzîm bibin esasê cumhuriyetê, mahkeme, idare û qanûn derxistin ji hev bînin cihê kirin û serbixwe bin. Maf û azadiyên civakê yên aborî, siyasî û kulturî bînin garantîkirin, rejîmekî vekîrî yê demokratîk bînin danîn. Siyaseta derve ya dewletê di cumhuriyetek wiha de wê ne bes di bin nîrê Amerîka yan Sovyet yan jî dewletek din de be wê bi cîranên xwe re û bi hemû welatên çî Rojhilat û çî Rojava re xwedî tîkiliyên pîralî û hêja be. Ev jî wê bibin realîtekek ku hemû dewlet pê razîbin. Iraqek wiha demokratîk û ji du mîletan û eqelîyetan pêkhatî him ewlekariya ji bo Erebbî û Îsraîl hem jî ji bo cîranên dîtir. Loma jî wê bibin lingekî bîngê ewlekariya herêmê û ya cîhanê jî.

Di dîrokê de belkî tu carî berjewendiyên Kurdan bi vî awayî li gor berjewendiyên welatên cîhanê pêk nehatin. Îro firsetek tarîxî derketiye ber Kurdan ku wê yekê nîşanî cîhanê bidin. Lê gelo Kurd wê karibin, yan na. Ev jî wê di rojên pêş de diyar bibin.

## X a ç e p î r s

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1											
2											
3											
4											
5											
6											
7											
8											
9											
10											
11											
12											

**Amadekar:**  
**S. Rêving**

pronavê îşaretê "van" bi kar tê. c- Sînonîmeke "arvan" (berevajî) 3- a- Dumahîk, "netîce", Sînonîmeke "ard", "ar". 4- a- baş, qenc, b- tembel (berevajî). 5- a- Li aliyê koçerên Botan ji "evî" yê re tê gotin (berevajî), b- dayîk. 6- a- Navekî kuran, b- keçikên porsor, yan piçek zerik. 7- a- nexweşiyek (berevajî), b- Li Kurdistanê Bakur çiyayek. 8- a- Tiştên ku ne bi nivîkî, lê bi dev bînin gotin (berevajî) b- delîlên nexweşiyên. 9- a- Ajansa nûçeyên Îrlandî (berevajî), b- Sînonîmeke "a" ("a" min, "a" te), c- kesê kamûran. 10- a- Devera ku Ermenî û Azerbeycanî li ser şer dikin (berevajî), c- cihê ku genim lê dihêrin (berevajî) 11- a- Ol, ayin, b- daçkek (berevajî), c- hejmarek. 12- a- Ne kevin (berevajî), b- Tiştên şîrîn yên ji hevîr çêdikin, helawat.

**Çeperast:** 1- Li bajarê Mahabadê meydana ku Cumhûriyeta Kurd a Mahabad lê hat îlankirin. b- Alavên ji bo agir-dadanê. 2- a- di zimanê kurdî de daçkek (bere-vajî) b- werimîn c- navê rojê heftiyê. 3- a- Xefik, dek (berevajî), b- di kurmançî de pronavek, c- perê Swêdê. 4- a- Awayekî gazîkirina dayîkê, "yadê", "dayê", b- kesê li ber garanê. 5- a- kur, xort, b- Li Kurdistanê Başûr çiyayek, c- rengêk. 6- Li Misirê çemek, b- Cihaza ku nûçe, muzîk, programên fêrkirin, perwerdekirin, kêfxweşkirin û propagandayê û h.w.d. pê tînin weşandin û mirov li kûdera cîhanê be, dibihîse. 7- a- Vex-warînek, b- Sînonîmeke "ar", "ateş". 8- a- Demek ji rojê, b- mîrê diya mirov, c- teref, rex. 9- a- Mirîşk, mamîrk, b- awa, terz. 10- a- du herfên bêdeng, b- Sînonîmeke "kok", "rih".

c- Di kurmançî de paşdaçkek. 11- a- Kesê ji qewmê Îraniyan (berevajî), b- Organeke laşê mirov, c- Mirov pê porê xwe rast dike. 12- a- Kesê ku nan dipêje, firneçî, b- bîna, xaniyê mezin.

**Serejêr:** 1- a- Kesê tamsar, b- Navekî kuran. 2- a- Bajarekî Îranê, b- Li hinek cîhan di şûna

### Bersîva hejmarê 105-106'an

**Çeperast:** 1-a) Nûredîn Zaza. 2-a) eh. b) ekar. 3-a) vareb. b) legeng. 4-a) êvar. b) bizin. 5-a) siwar b) da. 6-a) in. b) derman. 7-a) par. b) îsal. 8-a) zavêr. b) of. 9-a) ar. b) arbez. c) iç. 10-a) va. b) em. c) torê. 11-a) aw. b) irs. c) kever. 12-a) xak. b) firmeh

**Serejêr:** 1-a) Nevisî. b) ava. 2-a) ûhd. b) îzrawx. 3-a) rêwî. 4-a) evan. b) varik. 5-a) debar. b) pêr. 6-a) îk. b) darbest. 7-a) nal. b) ber. c) em. 8-a) zreb. b) kr. 9-a) hirmî. b) tem. 10-a) ez. b) aso. c) ove. 11-a) nidnafireh. 12-a) ogna. b) çêr

**Kaseta Koma Pêşeng hûn dikarin ji adresa jêrîn temîn bikin**  
  
Box: 152 16  
161 15  
Bromma  
Sweden



## Serpihatiya xezala Kuweyti û mirîşka Swêdi Karê aqila ye, yan na

Çendekî berê Zinarê Xamo bi heyçanek mezin ket civîna redaksiyonê, got "Min du xeberên muhîm bidest xistine ji bo quncikê Hesên Mizgîn ê "Ne karê aqila ye lê rast e" û herdu xeberên ji rojnameyekê jêkirî avêtin ser masa redaksiyonê. Hesên Mizgîn di bin çavan re li Zinarê Xamo nihêrî, lê deng nekîr rahişt her du kûpûran û dest bi xwendinê kir. Zinar serê xwe xistibû ber xwe û di bin simbêlan re dikeniya. Xeber, yek jê li ser krîza Xelîc bû, wiha destpê dikir:

"Iraqiyên heywanên bexçê heywanan(zoo) yê Kuweyti xwarin. Nimînendeyekî ji Yekîtiya Cîhanî ya Parastina Heywanan yê bi navê Victor Watkins, di rojname Londonî ya Times de giliyê xwe kir ku dagirkerên Iraqî nêzî ji % 70'yên heywanên bexçê heywanan(zoo) yê Kuweyti xwarin. Karmendên baxçê heywanan piştî dagirkerî, bexçê bi cî hiştin û reviyên. Loma heywanparêz îddîa dikin ku hemû heywan niha hatine qirkirin ku di nav wan de hin xezal jî hene ku kêmtên dîtin."

Xebera duduyan jî li ser mirîşkek Swêdi bû. Xeberê wiha destpê dikir:

"Îzin heye ku mirîşk li malê be  
Êdî biryara dawîn derket: fîmilya Larsson a ji Onsala êdî dikare mirîşka xwe li malê bihêle. Mahkema Bilind a Götterborgê piştî gelek çûn û hatin û lêkolînan biryar bi vî awayî da."

Li gor xebera dûr û dirêj a rojnamê bi kurtî mesele wiha bû: Jina malê Irlis Larssonê mirîşkek anibî malê û pûna wê di hewşê de çêkiribû. Lê pûn pênc mîtro nêzî pencera oda cîran bû a ku tê de radizan. Loma ji cîranê qîma xwe pê neanî, îddîa kir ku mirîşk wê "qidqidê" bike û xewa wê ya sibê ya şêrîn biherimîne. Li cem Dezgeha Hawîrdor û Tendurustî îtiraz kir: Bi vî îtirazê Dezgehê heq da cîranê û izin neda ku Irlis li malê mirîşkê xwedî bike. Irlis Larsson li ser vî li mahkemê dawê vekir. Mahkemê lêkolîn kir, pisporek şand li ciyê mirîşkê keşif çêkir, lê wê jî biryar da ku Irlis nikare mirîşkê li malê bihêle. Înada Irlisê înadek temam bû. Dest ji ber xwe venekîşand vê carê îtirazî mahkema bilind a Götterborgê kir. Irlisê di nama xwe de diyar kir ku mesela 'qidqida' mirîşkê ku wê cîranê ji xewa şêrîn a sibê şiyar bike, ne di ciyê xwe de ye. "Eger dîkek jî li balê hebûna" digot Irlisê "diket serê min, lê mirîşka bi tenê wê çî qidqidê bike" Dawiya dawî mahkema bilind a Götterborgê biryar da ku bi rastî jî nerihetkirina mirîşkê wê ne zêde be, loma jî Irlis Larsson kare mirîşka xwe li malê bihêle.

Gava Hesên Mizgîn her du xeber xwendin, xelas kirin bi piştî destê xwe ew virvirandin û got "çi tîkiliya van xeberan bi quncikê min heye. Piştî ku yek jê li ser Iraqiyên û ya din jî li ser Swêdiyan e her du jî karê aqila ne û her du jî rast in."

Em yên redaksiyonê gîş di fikra Zinar da bûn lê ji tîrsa Hesên me dengê xwe nekîr. Xwiya bû gotina Hesên bahane bû, ew esas dîtirsîya ku quncika wî ji dest here. Loma da dilê wî jî di cî de be me ev xeber ne di quncika wî de lê li vir çap kir. De êdî bira xwendevan biryara xwe bidin ka ev her du xeber karê aqila ne yan na.

### ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesên Mizgîn

Li dinê heywanê herî mezin ku îro dijî, balnaya şîn e. Dirêjahiya balnaya şîn digihîje heya 33 m. û girantiya wan heya 177 tonan.

**Yek ji nexweşîna ku li ser pîr kêmtên hatîye nivîsandin nexweşîna kenê "hişk" e. Ev nexweşîna tenê li Gîneya Nû di nav eşîra Fore de heye. Netîca nexweşîna kenê "hişk", mirin e.**

Carna tê qalkirin ku kesên din her tiştê ku tê ber wan davêjin devê xwe. Di Hezîrana 1927'an de du doktor, Chalk û Foucar ji nexweşxana Ontario li Kanadayê, yekî ji ber êşa zik ameliyat kirine. Ji zikê vî dinî 2533 tişt derketine û ji wan 947 tişt derziyên xwarkirî bûne.

Tiştê herî giran ku ji zikê insan hatiye derxistin 2,53 kg. por bûye. Ev ji zikê jinikeke 30 salî ji Britanyayê li nexweşxana South Devon and East Cornwall di roja 30'ê Adara 1895'an de hatiye derxistin.

## Ferhengê Lîteratûrî

Amadekar: Bavê Nazê

Hemd ji Xwedê re, roja îro gelek babet bi zimanê Kurdî têne nivîsandin. Rexnegirî jî yek ji wan babetê ye. Bi xwe bêtî zanebûna mana termînen lîteratûrî, dê bi dijwarî naveroka nivîsa di vî warî de, bête fahmkirin.

Wek nase, problema herî mezin li cem merovê ku bi zimanê Kurdî dinivîse, nebûna formek standart di zimanê me de ye. Ji ber vî nebûnê, her tim tevlihevbûn di serê xwendevanan de peyda dibe. Û ji kesên nezan û bêwijdan re ev tişt dibe qada pê listinê. Di vî warî de nimûne pîr in; afirandina bêjeyan bêtî bingehekê ilmî. Yan jî ji zimanên din bi karanîna hevokên standart, bêtî ku ew tîkevin qalib û tebieta zimanê Kurdî.

Helbet ev diyarîyên ha gelekî jiyane digihîne ziman û çanda me. Di nêrîna me de, wê ev problem di zimanê Kurdî de dom bike, heya ku dezgehê ilmî neyê avakirin. Lê mixabin avakirina dezgeheke wiha ne wilo hêsan e. Diyar e, ji ber vî çende, gelek ji me, li gora zanebûna xwe û bi tena xwe yan bi çend hevalên xwe re dadikevin meydana dameziran-dina gotinan û termînan. Di vî warî de, ezê vî heqî nedim xwe. Lê belê ezê termînen lîteratûrî weku di orjînalê de hene pêşkeşî xwendevanan bikim û li gora zanebûna xwe, ezê wan bi nav bikim. Pêwîst e bête gotin ku me termînen xwe ji ber ferhengê lîteratûrî ya bi zimanê Rûsî wergirtiye. Her weha jî me nivîsên G. Paspêrov, G. Avramoviç, A. Ovçaniko, L. Bextîn û T. Mofoyev ji xwe re kirine jêder.

Lîteratûra

Peyva lîteratûrî(edebyatê) ji zimanê Latîni hatiye. Lit bi mana tîpê tê û eraturî bi mana nivîsî ye. Bi mana xwe ya herfî dibe; tîpên nivîsî. Bi gotîneke din ew hunermendiya gotinê ye. Lîteratûra wek rengê ji rengên hunermendiyê, rengevedana îdealên estetîk ên komek ji komikên civakê ne.

Lê belê lîteratûra bi mana xwe ya fireh, bi rehê xwe vedigere destpêka heyîna merovan. Û bi rîya marîfeta rola insan di prosesa çalakiya dîrokî de, li ser axa folklorê ava bûye. Di qonaxa xwe ya pêşî de, di formê stran û çîrokên de bû.

Lê dîre hêdî hêdî bi pêşketina civakê û îktîşafa nivîsê, guhartîne cewherî, di lîteratûrayê de peyda bû. Stran û çîrokên ku bi dev dihatin gotin, êdî ciyên xwe li ser rûpelên kaxizan girtin. Bi vî hawayî guhdar bûn xwendevan, pêşengî ji guhdariyê dikeve destê xwendinê. Ji ber vî yekê lîteratûra pewendiya xwe ya seraser bi xwendevanan re wenda kir. Lê di eynî wextê de rîyeke belavkirînek fireh li ber vebû.

Helbet bi naveroka xwe jî dewlementir û kûrtir bû û bi tîma xwe jî pîralî bû.

Bi gotînek din, lîteratûra kirasê folklorê ji xwe kir û bi pêşketina civakê roj bi roj jê veqetiya û her yekê ji wan(li gel hinin rewîştên wek hev jî) formek xwe ya bi taybetî stend.

Bi xwe, di lîteratûrê de, sentezê guhdan û mûqayetiye- insan e. Û insan jî bi giyan û qerekerê xwa aloz û pîralîye. Her çiqasî bergeha jiyana wî fireh be jî, tenê lîteratûra wek rengê ji rengên hunermendiye, dikare vî bergeha fireh û aloz bide ber xwe. Bi taybetî lîteratûra ji ber ku wesîla wê ya tabîrî gotin e dikare bi vî dilê(mê(wezîfê) rabe. Ji ber ku gotin bê sinor xwedî huner û îmkaniyete. Ew dikare pesenda (teswîra) merovan bi hemû dewlemediya wî(rewîştên nefî, bedenî, axaftin û jiyana wî ya civakî û nêrînen evîni) bike. Lîteratûra rê li ber şexs vedike ku xwe bi xwe pêwendiyên bi diyariyên hawîrdora xwe deyne û helwîstê(mewqîfê) xwe ji heyama ku ew tîde belû bike.

Li gora gotina K. Marks, insan komek ji peywendiyên civakê ye. Heger bi gotina Marks be, mana xwe dema lîteratûra jiyana insan rengvedan dike, di eynî wextê de civakê hemû di xwe de gewde dike. Lê belê divê bête gotin ku lîteratûra çiqasî tabîrî be jî, nikare wek resim dîmenê insan ber bi çav bike û rengê estetîk(spehî) ê dîtinê pêşkêş bike. Lê tewî wihaye jî lîteratûra bi xwe(bi alîkariya gotinê) dikare rewîştên insan wilo gewde bike, heya di hêla ku merovê xwendevan bi hestê xwe bi spehîbûnê bihise.

Lê belê lîteratûra pêla ku insan teswîr dike, teswîra peywendiyên wî bi xelkê û xurîst(tebîet) re jî dike. Bi gotînek din; dijîti û xebata wî bi diyarîyên hawîrdorê re belû dike. Bi vî yekê sîjê(1) û kompozîsiyon(2) berhemê aloztir û dewlemendtir dibin. Bi xwe dijîti û kronîka pêşketina meydanên ku nivîskar lehengên xwe tê de digêrine, dibin bingehekê kompozîsiyona berhemê. Ev peywendî, bi awakî objektîv li gora mercên dîrokê tîne ravekirin û çerçewa berhema nivîskar xwiya dibin. Lê belê nivîskar li gora nêrîna xwe teqîm dike.

Wilo jî, di sîjê de jî tevlihevbûna jiyane belû dibe, lêbelê di hundurê wan bûyan de qerekerê lehengan pêşkêş û ber bi çav dibin. Sîjê wek sistema bûyanan dibe xêz û xaçerêkên di hundurê bûyerê de, yên ku leheng didin ser û dimeşin. Her ew bi wir de diçin, ew pêrgî tiştên nuh dibin. Û bi dijîti û şer, pêwendî û danûstendina bi hev re, qerekerên lehengan çî yên negatîv û çî yên pozîtîv xwiya dibin.

Bi xwe li gora alozbûna kompozîsiyonê û pîrbûna xêzên sîjê cînsên edebî û rengên wan jî hev tenê xwiya kirin.

**Gelo termînen cîns û**

**rengên lîteratûrê çine?**

Em termîne cîns ji ber yê Frensîzî werdigerînin. Herçî ev termîn bi jahîr tê bi dev kirin û di zimanê Rûsî de mana rengê edebî distîne. Bi xwe jî ber vî yekê carna tevlihevî di serê xwendevanan de çê dibe. Helbet nabe em rengên edebî û cînsên edebî bi yek manê bistînin. Di nêrîna me de, ya baş ew e ku di zimanê Kurdî de, em navê cîns li hersî celebên edebî bikin. Ew celeb jî ev in:

1- Epos(ji peyva Yûnanî epos hatiye. Mana xwe ya herfî; bêje, peyv an gotin e)

2- Lîrik(ji peyva Yûnanî lyrcos, tê. Ew jî ji strana li ber saza lîrê hatiye)

3- Drama(Ji peyva Yûnanî drama hatiye û bi mana neşatê tê. Yan jî çûn û hatina artîstan li ser sahnê)

Lîteraturnas her cînsê jî van cînsan li gora naverok û foma xwe perçeyî rengan dibin. Û hin rengên bingeîn ên Eposê ev in: Roman, çîrok û kurteçîrok Rengên Lîrikê ev in: Evîni, stran, surûd, roman, hîca, şîni û yên din.

Herçî drama sê rengên wê ne: Drama, Komediya û trajediya. Diyar e, li vîra pêwîst e em cîns û lîteratûrî û rengên wan(heger bi kurtî jî be) ji xwendevanan re rave bikin.

Epos, di destpêka xwe de bi tonê çîrokê, li ser bûyarên girîng di jiyana eşîrî de, di hate gotin. Ew bûyer dibe ku li ser nêçîrê be yan jî li ser diyarîyên ku bi xurîstê re diqewimî be. Lê piştî ku epos ket qalibê estetîkê êdî forma rengê jî yên hunermendiyê stend. Heyamê berê ew bi tonê şîrê di hate gotin, lê dure kete forma prozê (nesîr) û bi îktîşafa nivîsê zû bi zû bi pêş de çû û xwe guherand. Epos bi cewherê xwe objektîv e û şexsê nivîskar tê de wînda ye. Bi xwe her çiqasî di berhemên eposê de nivîskar nexwiya be, her wîqasî feniya wê baştir dibe. Ji ber vî çendê divê destdirêjiya nivîskar di berhemê de nebe û ku hebe jî, pêwîst e veşartî be. Tenê di berhemên edebî yên avtobiografi de, rê li ber nivîskaran vedibe ku ciyê xwe di wan de bigrin.

Me li jor, Roman, çîrok û çivanok wek sê rengên eposê nivîsî bû. Niha emê yeko-yeko hebekî bi firehî, li ser wan rawestî.

1- Sîjê peyvek Fransî ye û bi mana madê, naverokê yan sistema bûyanan tê.

2- Composito, peyvek Latîni ye, bi mana terkîb, avahiyê tê. Emê bi pêş de li ser van termînan bi firehî rawestî.

**Di hejmara bê de roman çî ye?**